

Şairê
mezin î Kurd
Şêx Reza
Talebanî

Rûpel 11



Weke ku di gotinên pêşyan de jî heye: Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê tune. Xayînen di nav gelan de jî wek kurmê daran û zewala herî mezin ji van xayînan digihîje gel. Lê dîsa tê gotin ku "kesê bi kêrî gelê xwe neyê bi kêrî gelekî din jî nayê." Lê Komara Tirk her tim vê rastiye jî bîr dike û çiqas dikeve tengasiyê hêviya xwe bi xayînen Kurd ve girê dide.

Hewldana zindîkirina Hemîdiyan

Dewlet bi civîna 12 serokeşîrên Kurd ên ceş dixwaze li hemberî Kurdan şerekî pîs î gemarî bimeşîne û Kurdan bi sîng bispêre hev. Ev siyaseta di dema Osmanî de bi Alayên Hemîdî hatibûn pê û gelek Kurd û Ermenî hatibûn qetilkirin.

Rûpel 8

Komara Tirk zimanê Kurdî pejirand

Dadgeha Ewlekariyê ya Stenbolê der barê rojnameya me de daxwaza girtinê kir. Dozger Mehmet Demîrcî Welat ji ber du nivîsên di hejmarê 73. de hatibûn weşandin (Gelê Tirk jî bi ser xwe tê û Li Edenê polîsan teror pêk anî) sûcdar kir. Danişîna vê dozê wê roja 31'ê Çileyê 1994'an li DED'a Stenbolê çêbibe. Bi vê îdîannameya dozgerê DED'ê, dewleta Tirk ji aliyekî ve hewl dide ku rojnameya me ya hefteyî bigire, ji aliyê din ve, ji ber ku di îdîannameyê de peyva Kurdî derbas dibe hebûna zimanê Kurdî bi dekekî fermî dipejirîne. Di teblîxatê de hatiye nivîsîn ku nivîsarên Welat ji aliyê wergêrekî sondxwarî ve hatine wergerandin.

Rûpel 9

Di 27'ê Mijdarê de:

Gelê Kurd bi rastiya xwe hesiya



15 saliya damezirîna Partiya Karkerên Kurdistanê bi van rastiyan girîngiya xwe hin bêhtir dide zanîn û xwedîderketina li vê têkoşînê dike peywira her Kurdekî/ê ku li ser vê axê diji.

Rûpel 14

Siya çekên nukleer li ser jiyane



Îro li ser dinyaya me sîrf li ser erdê Rûsyayê 35 hezar fuzeyên nukleer ên bi serîk hene. Ên li ser erdê Amerîkayê û li deverên din ku bêne hesabandin dê hejmara fuzeyan derkeve hejmareke mezin. Ev çekên nukleer demekê ji bo serdestiyê û ji bo cedelê li ser rûyên dinyayê hatine veşartin; lê ev dewlet zû heşyar bûn.

Rûpel

Piştî heftê salan

Berî hemû tiştî em Kurdên Sovyeta berê, geleki kêfxweş û şa ne. Piştî 70 salî em înfomasyonan ji welatê ku da yika me hemû Kurdan e, hêlîna me ya starê, ji Kurdistanê, zefîrîn ji bi riya rojnama Welat haya me ji welatê bav û kalan çêdibe. Em Kurdên Sovyeta berê ji hemû cureyî (teşkilî) gorî îmkenên xwe li kêleka şerê serxwebûn û azadiyê sekinîne. Ev pêşketina me hemûyan e, wê me bibe serfiraziye. Çawa dayikê xelkê ji mirov re nabin dayik, cih û warên xelkê jî, ji mirov re nabe welat. Lewma ji her miletek bi welatê xwe ve çaxa girêdayî be, wê qedr û qîmeta wî jî di nav dinyayê de hebe.

Em baş dizanin ku dinya ji şerê li Bakurê Kurdistanê ku ji bo serxwebûn û azadiyê tê kirin bêhay in û naxwaze bibîne. Lê çî dibe bila bibe, gava miletek li ser hîmê rastiye bi rêberiya seroktiya rast rabe, wê xwe bigihîne serfiraziye. Gelê Kurd îro ev fesal xistiye destê xwe, tu quwet û hêz wê nikaribe li ber gelê Kurdistanê xwe bigire. Serketina gelê Kurdistanê ye.

Roja 15.08.1993 li Ermenîstanê pîroziya neh saliya

ordiya me ARGK hat pîrozkirin. Li pişt Çiyayê Elegezê nehiya Axbaranê, li gundê Elegezê gundên Axbaranê, Avşênê, Sîpanê, Cercerîsê, Riya Teze, Senqerê û ciyê mayin nêzikî 3.000 kes bi dilekî şa kom bûn. Di evarê de wekilê millet Profesör Şerefê Eşîr, Zurbe İboyan, Serokê rojnama Botanê Ezîzê Cewo û Serokê rojnama Riya Teze Emrîkê Serdar, bi dengê xwe yî xweşik ku li hemû Kurdistanê tê guhderkirin, Serokê Radyoya Yêrewanê a Kurdî Ahmedê Gogê û koma muzîkê ji nehiya Eşmezînê jî beşdarî pîrozbahiyê bûbûn. Koma govendê ya gundê Avşênê bi navê Şehîd Cewo, listik û reqesên baş pêşkeşî gel kirin. Dîsa hozanê hêja Şemdîn, şev bi stranên xwe yî xweş û şîrîn şen û geş kir. Gava ku berpirsiyarê ERNK'ê Mihyedîn li ser rewşa welat axaftin çêkir, civat wek serhildanekê, bi sloganan çiya hejandin. Serokê Nivîskarên Kurd li Ermenîstanê Karlanê Çaçanî û gelek mêvanê din ji civata Ermenîyan li kêleka gelê Kurd sekinîbûn. Evar, bi govend, dilaneke xurt, def û zirne û bi dilxweşi hate qedandin.

Dîsa di 22.08.1993'yan de li Tiflîsê paytexta Gurcistanê jî sersala ARGK'ê hat pîrozkirin. Evar li Meydana Azayê, salona Tiyatroya Gîrî-boyêdova de ji 500 kesî zêdetir gel beşdar bû. Program evarê bi Keremê Anqasî ve bi rengêki disiplinî û gelek baş ve hat derbaskirin. Di evarê de wekilê millet Yura Nabyev û Ordîxanê Qaşaxî, koma govenda Kurdî, Casimê Cerdo, Milazim, Osê Sultan û Xemoyê Hesen bi stranê welatparêzî evar geleki şen û reng kirin. Sazbendê komê bi dil û can ji civatê re hunerê xwe dan nîşandan. Dîsa Temûrê Dasînî bi marîfeta xwe ya destan, gelek tiştên welatparêzî bi sêrbaziya teknîkê ve şanî kir. Hozanê Kurdistanê yê hezkirî Şemdîn bi dengê xwe yî şîrîn û şewat gelê di evarê de şa kir û bi çend curan li gorî stranên naveroka wan bi kaseta video li ser perda sipî numûnê jiyana welat dan şanî. Civata ku beşdarî vê evarê bûbû, bi moralekî xurt çûn malên xwe. Em Kurdên Sovyeta berê bi riya rojnama Welat silavê xwe bi dil û can ji we re dişînin.

**Rêxistina Ronahî
Tiblîs**

Nivîsara Welat

Dewlet û zimanê Kurdî

Ji zû ve ye em li hêviyê bûn. Dawî bi awayekî fermî dewletê dest avête zimanê Kurdî û xwe, ne rind jî be, fêr kir. Lê ji ya hemûyan girîngtir bi vê yekê hebûna zimanê Kurdî qebûl kir. Bi awayekî din ku mirov bibêje, rastiyeke ku nedixwest bîne zimên, îtiraf kir. Dozgerê Dadgeha Dewletê ya Ewlekeriyê Mehmet Demircî du nivîsên Welat, xwedêgiravî bi destê wergêrekî sondxwarî, dane wergerandin û ji vê wergerê beşên ku sucdar dîtine, bi teblîxatekê ji me re şand. Di dawîya vê nivîsa ku ji me re şandine de, wiha dibêje: "Li gorî pêdiviya madeyên qanûnên hejmara 3713 û 5680 daxwaza biryara cezakirina Mazhar Günbat û girtina rojnâmeya bi Kurdî Welat li ser navê gelemperiyê tê kirin." Ev doza ku der heqê Welat de hatiye vekirin, roja 31'ê Çileyê 1994'an dest pê dike. Dewlet bi dozvekirinê dixwaze çî bike û çî encam derdikeve holê? Bêguman armanca wê ya yekemîn rê li ber me girtin e, qede-xekirina Welat e. Ev hewlê dan a dewletê diyar e. Lê ji hêleke

Di dîroka komara Tirk de ev cara yekemîn e ku hebûna zimanê Kurdî bi devekî resmî tê qebûlkirin. Di teblîxata ku ji me re şandine de qala zimanê Kurdî û wergêrekî Kurdî yê sondxwarî (yemînî tercuman) tê kirin. Em nizanin ka dewletê ev wergêr ji xwe re ji cihekî kirriye an ew gihîştandîye. Lê ji kuraniye bila anîbe, di encama vê bûyerê de, bizanebûn an jî bêzanebûn meşrûiyeta zimanê Kurdî dipejirîne.

din ve ku mirov lê vê helwesta dadgehê dinêre û dinirxîne tiştêki din ê nû ku pîrr balkêş e, derdikeve holê. Dewleta Tirk bi vê dozvekirinê re, bi devekî fermî (resmî) hebûna zimanê Kurdî dipejirîne. Di dîroka komara Tirk de ev cara yekemîn e ku hebûna zimanê Kurdî bi devekî fermî tê qebûlkirin. Di teblîxata ku ji me re şandine de, qala zimanê Kurdî û wergêrekî Kurdî yê sondxwarî (yemînî tercuman) tê kirin. Em nizanin ka dewletê ev wergêr ji xwe re ji cihekî kirriye an ew gihîştandîye. Lê ji kuraniye bila anîbe, di encama vê bûyerê de, bizanebûn an jî bêzanebûn meşrûiyeta zimanê Kurdî dipejirîne. Ji ber vê yekê em vê yekê wek pêşveçûneke objektîf dinirxînin. Pejirandina zimanekî pêvajoya heftê salan qedexekirî, gaveke hêjayî nîrxandinê ye. Di encama vê dozê de, dibe ku Welat bi destê Dadgeha Ewlekeriyê vê be girtin. Lê Dewlet Welat bigire jî awa û sebêbe girtina wê, wisa xuya ye, pejirandina Kurdî ye. Çunkî ne ji ber zimên, ji ber naveroka nivîsên Welat doz vekiriye. Bêguman, dewletê bêhemdê xwe derketina Welat pejirand û her wiha bêhemdê xwe zimanê Kurdî jî pejirand.

Têkoşîna ku li Kurdistanê tê dayîn û serhildanên gelê Kurd dewlet mecbûr kir ku Welat û zimanê Welat bipejirîne. Bes, bêhemdê dewletê jî, ev rastî derketibe holê, ev gaveke girîng e û pêşveçûnek e.

Li aliyê din, emê li dijî girtina Welat derkevin. Ji bo ku Welat neyê girtin emê hemû îmkanên xwe seferber bikin. Emê hemû riyên hiqûqî biceribînin. Dibe ku dîsa jî Welat were girtin, ji ber ku tu baweriya me bi meşandina awayên wan ên hiqûqî tune; kengê dikevin zorê, dev ji tatbîqkirina hiqûqa xwe jî berdidin. Lê em dibêjin bigirin jî, ew ji me xelas nabin. Emê dîsa Welat derxînin. Bi riyên legal nepejirînin, emê bi awayekî din derxînin. Welat rojnâmeya me ya neteweyî ye, ew berhem û kelepora têkoşîna şervanên serxwebûnê ye. Ji ber vê yekê tu hêz nikare rê li ber bigire.

Heta têkoşîna rizgariya gelê Kurd gihîştîye vê ser-pilkê, me bi hezaran şehîd dane. Ev rojnâme kelepura têkoşîna şehîdên Kurdistanê û hilperîna şervanên azadiya ye. Ji ber van sebebên najêger, bi çî awayî dibe bila bibe wê Welat derkeve. Welat mewziyeke girîng ya ku bi têkoşîna salan hatiye bidesxistin e. Mewziyên bi têkoşîne hatine qezenç kirin, dijmin jî baş dizane ku zû bi zû nayên berdan.

Ma ev jî bû şaristaniyet?

Mehabat Kurdî

Şaristaniyet "civilization" li komeleke destkeet, serkeftin û desthatiyên pêk tê ji aliyên fikrî, civakî, exlaqî û îndustriyê ve. Hin kes vê peyvê tenê di warê kulturê de bi kar tînin, lê hinekên din jî wê bi maneya "zelalbûna eqil li ser civakê-komelgehê" dixebtînin.

Li vir em zêde li ser wateya şaristaniyetê nasekinin, çunkî armanca me jî ne ev bi xwe ye. Lewre em diçin ser naverok û derdê dilê xwe. Mesele dîsa girêdayî rewşên bîran e. Ez bi xwe vî tiştî wekî ku dibihîzim û pê dihesim tînim ser rûyê kaxez.

Li Ewropayê, bi taybetî jî li Swêdê, rewşên bîrên Kurd ne kêmin. Bêguman em tev dizanin ku mirov nikare ji her kesî re ku xame di dest de ye bibêje rewşên bîr û ronakbîr. Bi rastî wezîfe û delameta rewşên bîr ne hêsan e.

Gelek car li van deran "Swêd, Almanîya, Danîmarkayê û hwd" civîn û kombûnên rewşên bîranên lidarxistin. Bi rastî hinek caran tiştên komîk û bawernekirî tenê guhê mirov. Bi kurtasî mirov bawer nake ku ronakbîr û ronakbîrên geleki bîndest wisa bifikirin an jî xwedanên ramanên bêbingeh û hiç û pûç bin. Di civînekê de hevalekî "sozdar" ku xwe bi rewşên bîr nedizanî wiha gotina xwe anî zimên: "Civîna rewşên bîran serê mirov diêşênin!" Bi rastî gotina wê heger bo we sert be jî, ji bo min ku beşdarê civîne bûm, di cihê xwe de ye. Hevalên hêja û bergiran ên rewşên bîr, her gav pêşniyar û rexneyên wan

heger zêde nebin jî ne kêmin, lê kar û nebat?!

Alet û pêşketina teknoloji û şaristanî pîwîst e ku di xizmetkirina mirov û doza heqxwazî û mirovatiyê de bin. Pîrr caran, eger mirov bi hêz nebe, amûr (alet) wî/wê dikin burokrat û pozbilind û efendiyên sermezî û bêmêjî û eqil biçûk, ma ne wîlo ye?!

Gelî rewşên bîran! Min şaş fêm nekin, ez jî mîna we kompiyoter û faks û telefon û aletên din jî bi kar tînim, di kar û barên xwe de û çî eybek di vê karê de tune jî.

Min çend caran nivîs li ser burokratiya nivîskar û rewşên bîran xwendine, bi taybetî jî li ser nivîskariya li welatê Swêdê. Ev kar heta radekê ez jî qehrandim, lê heqîqet tehl e.

Rewşên bîr çiqas girêdayî doza gelê xwe be hê jî her kêmin e, çunkî gelek hêvî û kar û çalakî ji wî/wê tê xwestin. Encamdana van jî bi tenê dibe pêwan ji bo ektîvbûn û nebûna kesekî welatparêz û rewşên bîr. Helbet eger em rewşê welatî binîn ber çavên xwe wê demê erk û wezîfa me geleki zêdetir dibin, bi taybetî jî di roja îro ku em tê de dijîn.

Li ba min eşkere ye ku babeteke wisa girîng bi rûpelek û du an tewaw nabe, bi Kurdî ev hevîr aveke zêde dixwaze, lê mirov dikare bi çend peyvên jî derdê dilê xwe beyan bike.

Di dawîya vê nivîsa kin de hêvîdar im ku ronakbîrên me yên hêja li min zîz nebin, mebesta min tenê xizmetkirina dozê ye. Serkeftina we kamuraniya min e!

NÛÇEYÊN CENGÊ

Gelê Kurd li ber xwe dide

Hêzên dewletê vê hefteyê jî êrîş birin ser gundan û gelek xesirandin û gelek kes xistin bin çav. Ji aliyekî din ve jî gerîlayên ARGK'ê qereqol û avahiyên dewletê dan ber gulle û roketavêjan, gelek xesarên mezin li wan avahiyên kirin. Ji bo ku êrîşên ARGK'ê bê birrandin, dixwaze ku hemû rê û dirbên gerîla bidin girtin û ji bo vê armancê jî gund û navçeyan didehibîne, dest dide ser zexîre û mal û samanên wan. Dewlet îro jî bi pey hinek eşîrên Kurd ketiye û ji wan mirovan dixwaze ku bixe tîm û li hember gelê Kurd bide şer kirin. Lê gerîlayên ARGK'ê hemû projeyên dewletê bêhavil dihêle û ji aliyê pozberiyê ve gelek êrîşên serfiraz pêk tîne.

Navenda Nûçeyan - 18 Mijdar 1993: Li Sêrtê li navçeya Hewêlê (Baykan) li herêmên çiyê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di bûyerê de 11 gerîla hatine kuştin û der heqê kuştî û birîndarên dewletê de agahî nîn e.

Gerîlayên ARGK'ê ji erebeyê tîmên taybetî re, li herêma gundê Şaxbê, ku li ser Hezoya (Kozluk) Elihê (Batman) ye kemîn danîn. Komîserek û 3 tîm birîndar kirin.

Radyolînga TRT'ê ya Cizîrê, ku li ser bajarê Şîrnexê ye, ji aliyên gerîlayan ve hate xesirandin.

Gerîlayan avêtin ser qereqolên Behmar û Sadayê ku li ser Cizîrê ne, ziyaneke mezin gihandin.

Li Midyadê li gundê "Kaya-lipinar" û "Yolbaşiyê" gerîlayên ARGK'ê êrîşek anîn pê. Di bûyerê de mala mixtarê gund û mala cerdevanekî xesirî, kesek jî birîndar bû.

Du kes li Dîgorê ji aliyên gerîlayan ve hatine kuştin.

Hêzên dewletê li Şîrnexê li navçeya Silopiyê, êrîş birin ser gundekî, jê kesek kuştin.

Kamyoneke cerdevanan li ser riya Midyada Mêrdînê li mayîne qelibî, di bûyerê de 2 cerdevan mirin.

19 Mijdar 1993: Hêzên dewletê êrîş birin ser navçeya Bazîda Agiriyê, gelek dikan û dezgehên kar xesirandin.

Li Mûşê hêzên dewletê cerdî ser nehiya Vartinisê kirin û 3 mal xesirandin û 17 kes xistin bin çav.

Car mal ji aliyên leşkeran ve hatin şewitandin. 2 kes jî

hatine girtin. Ev bûyeran li Diyarbekirê li navçeya Qulpê gewimîn. Gundên nevwçeya Heskîfê (Hesenkeyf), ku li ser bajarê Elihê (Batman) ye, ji ber kotekî û terora leşkeran koçkirin. Hêzên dewletê operasyonên dorfireh li gundên Îdirê pêk tînin. Çiyayên Agiriyê jî tînen bombe kirin. Ji ber operasyon û agirên bombeyan, gundên Korxan û Mexsezîlo vala bûn. Li Elihê li kolana Diyarbekirê 2 erebeyên Muduriyeta Parêzkariya Sivîliyê ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin şewitandin. Li Elihê li navçeya Bişeriyê kesek di otomobilekê de kuştî hate dîtin. Gundê Çimemêrgê ku li ser Bişeriyê ye, avahiyên dibistanê ji aliyên gerîlayan ve hatine xesirandin.

20 Mijdar 1993: Li Hazroyê û li Farqînê (Silvan) hêzên dewletê cerdî ser 2 gundan kirin û ziyaneke mezin gihandin wan. Zevî û zexîreyê gundiyan şewitandin. Traktorek texrîb kirin û 18 kes ji bo çekirina qereqolê xistin bin çav.

Gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser qereqola li gundê Kinyanîşê ku li ser navçeya Çelêya Culemêrgê ye, 11 leşker û cerdevanek kuştin. Di bûyerê de 8 gerîla jî hatin kuştin. Hêzên dewletê li ser vê bûyerê li der û dor operasyonan pêk tînin.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser Qereqola Qoserê (Kızıltepe) bi roketavêjan ve xesirandin.

Hêzên dewletê li Kufraya (Şîrvan) Sêrtê û li herêmên Sêrtê dest bi operasyonên dorfireh kirin. Li gorî çavkaniyên herêmî li her derê bêhedef bombeyan direşînin. Li der û dorên navçeya Hewêlê (Baykan) sewqiyeteke mezin pêk hat, hêzên dewletê bi balefiran ve çiyayê Kilîsê dane ber bombeyan.

Li Elihê li navçeya Hezoyê leşker daristanan dişewitînin. Operasyonên ku li herêmên Bestana Şîrnexê ji aliyên dewletê ve pêk hatin, didomin.

21 Mijdar 1993: Li Hezoxa (îdil) Şîrnexê piştî êrîş gerîlayan, hêzên dewletê her derê navçeyê dane ber gullebaranê, gelek mal xesirandin û 200 kes xistin bin çav.

Operasyonên dewletê li çiyayên Agiriyê sekinîn û li çiyayên Hezoya (Kozluk) ku li ser Elihê ye, hêzên dewletê dest bi operasyonên dorfireh dikin. Leşkeran cerdî ser 2 gundên Hezoyê, Merxê û Kahveciyê kirin; li van gundan teroreke mezin pêk anîn. Li gorî çavkaniyên herêmî cerdevanên der û dorên Hezoyê jî tevî vê operasyonê bûne.

Ew operasyonên ku li çiyayên Agiriyê didomin 2 gund ji cihên xwe koçber bûn. Li

gorî çavkaniyên herêmî ji ber bombebaran û êrîşên leşkeran bi navê Korxan û Mexsezîlo 2 gund serdanpê xesirîne. Li Agirî û Dutaxê 9 kes ji aliyên polîsan ve hatine girtin.

22 Mijdar 1993: Li herêma Badîkan ku li ser navçeya Pasûra (Kulp) Amedê ye, ji aliyên dewletê ve tê bombekirin. Li herêmê êrîşên leşkeran didomin. Leşkeran avêtin ser gundê Cûmariyê, xwediyê malê Atilla Öztür hildan birin. Li beldeya Giro-morê jî, mala Hacı Kazım Yıldızhan ji aliyên leşkeran ve hate şewitandin. Li herêmên Badîkan ku li ser Pasûra Amedê ye, ew gundiyan ku hatibûne girtin ji wan tu agahî nîn e. Ew operasyonên li herêmên Bestanê ku li ser bajarê Şîrnexê ye hê didomin. Li gorî agahiyên herêmî ta niha jê serbazek û 60 leşker hatine kuştin. Li Şîrnexê gelek leşker ketine kemîna gerîla jê 3 leşker hatine kuştin. Li Cizîrê ew panzera ku diçû operasyonê welgeriya, di bûyerê de 4 leşker birîndar bûn.

23 Mijdar 1993: Gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser navçeya Yedisuyê, ku li ser Çepeçûrê (Bingöl) ye, di navbera gerîlayan û cerdevanan de şer derket. Di bûyerê de 6 cerdevan û leşkerek hatine kuştin.

Li Elihê (Batman) erebeyaya ku li Taxa 19 Mayısê dewriyeyê digeriya, ji aliyên hinek kesan ve hate gulebarankirin. Di bûyerê de bi navê Serdar Selçuk polîsek hate kuştin û polîsek jî birîndar bû.

Li Silopiya Şîrnexê, li herêma riya Çamê, panzerek li mayîne qelibî û çawîşekî pispor mir.

Panzerek jî li nêzî Tabûra "İkizceyê" ku li ser bajarê Şîrnexê ye, li mayîne qelibî û der mafê mirî û birîndaran de agahî nîn e.

Di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li herêmên Sasona Elihê û Pasûra (Kulp) Amedê şer derket. Der heqê kuştî û birîndaran de tu agahî nîn e. Di bûyerê de tîmekî taybetî xwe şaş kir û cerdevanek kuşt.

Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser gundê Bekir, ku li ser Hezoxa Şîrnexê ye, bi navê Yusuf Bağım cerdevanek kuştin. Di bûyerê de gerîlayek jî bi agirê cerdevanan hat kuştin.

Li Amedê li navçeya Hazroyê li gundê Zoqbîrîne sercerdevan Heko ji aliyên gerîlayan ve hate kuştin. Piştî bûyerê hêzên dewletê bi tevî cerdevanan êrîş ser gundên Astro, Girsalat, Zugur û Qûbîkê kirin û gelek mal hurşandin.

Bi navê Turgut Barzan xortekî 12 salî ji aliyên polîsan ve bi agirî panzerê hate kuştin. Bûyer li Qoserê qewimî.

HAWAR

Dilbixwîn

Diya Egît

Berê xwe dabû jor û diqêriya, lê hema dizanibû kesek li dengê wê guhdarî nake, Lewre jî bêhêvî dibangand: "Ey xwedê! Êdî ez hew te Xwedayê xwe dibînim. Tu nikarî werî hewara min, belkî jî naxwazî, kî dizane... Here alîkariya ew kesên ku bi navê me dikujin bike. Here mizgeftên xwe biparêze. Mala te bûye navenda MÎT'ê, mala te bûye mala munafîqan û xwedênenasan. Biborin, ez hew dikarim barê te hilgirim, li min negire, ez neçar im..."

Diya Kurd bêçare mabû. Kesek nedihate hewara wê. Kesek lê xwedî dermediket. Ne xwedê û ne jî UNO. Lewma jî ji her tiştî nefret kiribû, tenê baweriya xwe bi

Min ew di filmeke dokumentar de dît. Dayîkeke Lîceyî bû, çavên wê tijî hêstir bûbûn, piştî xwe dabû devê kamereyan, diqêriya û digot: "Ji Welatê me derkevin, bila ez we li van deran nebînim. Hem me dikujin, hem jî bi cendekê me re dimeşin. Hûnê sibehê di nav rojnameyên xwe yê gemarî de binivîsinin ku PKK'ê em

kuştine... Ticaretê bi me nekin. Me nefiroşin, em ewqasî jî ne erzan in, herin filman li ser dayikên xwe çêbikin... Bicehemîn, bila çavên min bavkujan nebînin."

xwe yê gemarî de binivîsinin ku PKK'ê em kuştine... Ticaretê bi me nekin. Me nefiroşin em ewqasî jî ne erzan in, herin filman li ser dayikên xwe çêbikin... Bicehemîn, bila çavên min bavkujan nebînin."

Her tişt li pêşberî wê reş bûbû. Ji ber ku her tişt li pêşiya çavan reş kiribûn. Li kêleka keça xwe ya kuştî rûdinişt, xwe bi ser de xwar dikir, keserek hûr dikişand, hêstir paqij dikirin û bi xemgînî dinaliya: "Hawar Nazo ez bi qurban, diya te bimire, nemînim Nazo... Hewar, hewar li min bêkesê, li min xerîbê, li min berdiwara bê xwediyê... Nemînim, bimirim, kor bibim, bila êdî çavên min vê dinyayê nebînin..."

Li kameremanekî vejeriya û got: "Ez ji we rica nakim. Ez li ber we nagerim, bila di dilê Çîllera we de bibê hesret. Hûnê tu caran min li ber piyên xwe nebînin, hûnê tu caran nikaribin min bi kuştinan bitirsînin. Ne ji bo tîrsê, ne jî ji bo mirînê, ez ji bo jiyaneke bi şeref hatime vê dinyayê. Bikujin, heya hûn tîr dibin, lê hema bizanibin, min bi van herdu destan, rextê fişekan li bejna Hewar û Egîdê xwe girêda. Ji xwe min di jiyana xwe de careke tenê şahî dîtiye, ew jî roja ku herd zarokên min bûne gerîla. Here van gotinên min ji xatûna xwe re bibêje. Ez diya Egîd im, min nas bikin..."

Diya Egîd ceger dida me temaşevanan. Rojnamevan Tîrk bû. Ji kanaleke TV'ya teybetî re dikişand. Diya Egîd ew baş nas kiribû, gelek kesên wisa Mehmetçik dîtibûn. Lewma jî, nedixwest dilê wî geş bike, serê xwe bilind dikir û digot: "Eger tu van gotinên min belav nekî tu ne kurê bavê xwe yî. Ez diya Apociyan im. Serokê min Apo ye. Bijî SEROK APAO! Baş e?!" û tiliyên serkeftinê bilind dikirin. Eger mirov nebine bawer nake. Ji bo ku mirov bawer bike jî divê ku Diya Egîd nas bike.

Ji kerema xwe re li wê kasetê temaşe bikin. bibînin çawa bi nalîna li ser keça kuştî re li ber xwe dide... Êşa diya xwe, diya Egîd nas bikin.

zarokên xwe anîbû, Dizanibû, ji bilî "zarokan" kesek bi êşa wê nehesiyaye.

Min ew di filmeke dokumentar de dît. Dayîkeke Lîceyî bû, çavên wê tijî hêstir bûbûn, piştî xwe dabû devê kamereyan, diqêriya û digot: "Ji Welatê me derkevin, bila ez we li van deran nebînim. Hem me dikujin, hem jî bi cendekê me re dimeşin. Hûnê sibê di nav rojnameyên

Ji ambargoya li ser Haîtî

Kesên ku zerarê dibînin jin û zarok in


Nûçeyên Derve- Ambargoya ku Amerîka û NY'ê danibû ser Haîtîyê didome. Her çiqas hêzên Împeryalîst armanca vê ambargoyê wek avakirina demokrasiyê û dawîlêanîna rêveberiya leşkerî nişan didin jî, yê ku ji ambargoyê zerarê dibînin gelê xizan û nemaze jî zarokên wan in, ne general in.

Li gorî vekolîneke Zanistgeha Harverd'ê serî mehekê 1000 zarokên 5 salî û hîn biçûktir, li Haîtîyê ji ber xilayê dimerine. Sedema vê yekê ambargoya NY'ê ya ku di sala 1991'an de destpêkir e. Li gorî vekolîneke UNICEF'ê jî ji roja ku ambargo ketiye rojevê vir ve rêjeya (nîsbeta) mirina zarokên di bin 5 salan re gihîştîye % 58'an, ev rêje berî ambargoyê % 38 bûye.

Hîn jî hinek kes vê ambargoyê ji bo avakirina demokrasiyê û vegeftina serrokkomarê Kevin Jean Bertrand Aristide wek firsendekê dinirxînin. Demeke berî vê rayedarên DYA'yê bi kirinên xwe daxuyandin ku ev naxwazin Aristide bi şûn ve vegeftin û li dû listikên nû ne.

Hinek agahiyên çewt bi destê CIA'yê li ser Aristide hatin belavkirin, li gorî van agahiyên Aristide ne mirovekî demokrat e û nexweşîna giyanî derbas kiriye. Ji vê yekê jî tê fehmkirin ku rayedarên DYA'yê naxwazin li Haîtîyê demokrasiyê ava bikin, bes dixwazin rêveberiya leşkerî li gorî berjewendiyên xwe serrast bikin.

Wek ku bijîşkê Nexweşxaneyê Pierrapayen, Dr Victor Binkley dibêje: "Di



Wek hemû welatên din ên ku lê şer heye, li Haîtî jî, ji cengê zerarê mezin jin û zarok dibînin.

ambargoyê de ji kesên ku têne mirovên xizan û zarok bi destê leşkeran hatin kuştin zêdetir mirov mirin, sekî din."

Mebesta operasyonên Împeryalîzmê çi ye?

B. Dêrsimî/Parîs

Bihevratîya dewleta Tirk û Fransî, bi operasyona ku di 18.11.93'an de çebûyî xwe nişan da. Mebesta operasyonê ya herî mezin PKK'ê wek terorîst nişandan bû.

Operasyonê di seat 6'ên sibê de dest pê kir. Bi lêdayîna nêzîkî 120 welatparêz hatin girtin. Dema operasyonê malên wan girtiyan gelek xeserên dardingî jî dîtin.

Roja îne, ji aliyê Kurdên li Fransayê dijîn ve protestoyên mezin hatin li dar xistin. Li Parîsê nêzîkî 300 welatparêzî (pirranî jin û zarok) 3 saet'an "Notre Dame" îşgal kirin. Ji hakim daxwaz kirin ku girtiyan berde. Li Marsilya buroya Tv-A3 ji aliyê 150 welatparêzî ve hate îşgalkirin. Nêzîkî 50 kesî hatin girtin. Piştî çekirina fişên polis roja din hatin berdan.

Roja şemî; li ber "Palais de Justice" nêzîkî 300 welatparêzî protestoyek çekirin û 133 welatparêz hatin girtin. Li Liyone jî 200 welatparêzî protestoyek çekir.

Ji bilî 24 kesan mirovên ku, di operasyon û xwepêşandanan de hatibûn girtin piştî fişkirina polîsan hatin berdan. Ew 24 girtî jî mîna militanên PKK dan xuyakirin û doza wan roja yekşemê bi lez û bez çekirin. Ji ber ku yekşemê roja tatîlê ye û Kurd nikarin dengê xwe (protesto) bilind bikin. Piştî dozê 3 girtî hatin berdan û doza 21 girtiyan jî avêtin 25'ên Mijdarê.

Roja duşemê; saet li 11'ê sibê bi beşdarbûyîna nêzîkî 14.000 kesî wê meşek çebûbûya. Lê mixabin, di destpêkê de bi êriş û lédana polîsan meş hate rawestandî. Nêzîkî 150 welatparêz hatin girtin. Di navbera girtiyan û polîsan de şerekî mezin çebû û gelek welatparêz birîndar bûn. Paş fişên polis hêdî hêdî hatin berdan. Li wan protestoyan pirranî slogana "Bijî PKK" hate avêtin.

Radyo, televîzyon û rojnameyên Fransîyan gelekî cih dane operasyon û xwepêşandanan. Rojnameyên roja îne cihekî mezin dane bûyerê. Li aliyê din, gelek şexsiyet, partî û sendîqayan hikûmeta Fransî protesto kirin.

Mînak; Partiya Kominîsta Fransî

ÇGT Sendîka herî mezin. Ebûqatên sînomenas.

Dadga kirdinî bikujanî

Şerefkendi

Nûçeyên Derve- Ew pênc kesey be boney kuştinî çwar serkirdey hizbî Dîmokratî Kurdistanî Îran le hawînî salî parda, tawanbar kirabûn, rojî heyniy 19.11.1993 le berdemî dadga le Berlîn amade kran.

Yekê lem tawanbarane ke nawî Yusif Emîn e (21 sal) danî be beşdarbûnî xoy le tawaneda hêna û em karî kuştiney daye pal hendê Kurdî Îraq. Belam çwar hevalekey xoy bêwerî lem tawane nişan da. Yusif guftî: "Dû hevalî xoy dawayan lê kirdûwe bo ew leberdemî çêştixaney Yonânî (Mîkonos) biwestê û nehêlê kes biçête naw çêştixanekewe û ewanîs be boney karêkewe keçne jûrewê, paşî eme ew gwêy le dengî teqe bûwe." Yusif keşekî bi nawî Şerîf ewe û kesekî tirişî tawandar kirdûwe belam nawî nehênawe.

Perbirsîyanî Berlîn, dezgay muxaberatî Îranyan le kuştinêda tawanbar kir-



Seid Şerefkendi

dûwe û pêyan waye em Yusif Emîn e lemêjewe destî legel kuştin da hebûwe, herweha lelayan Ebas Rehîl nawêkî Libnaniyewe daway çawedêriy derewey çêştixanekey lê krawe. Yusif carî yekem ke gîra danî be beşdarbûnî xoy çwar hawelekey tirişî le tawanêda hênabû.

Şayanî gutine Dr. Sadiq Şerefkendi û sê hawrêy tirişî le serokayefî Hizbî Dîmokratî Kurdistanî Îran, le 17.9.1992 le şarî Berlîn be destî dujmanî Bizutnewey Rizgarîxwazî kurdewe tîror kiran.

Mamosteyên Kurd yekîtiya xwe ava kirin

Almanya, Welat- Di mējûya 20.11.1993'yan de, Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) li bajarê Braunschweige-Almanyayê kongreya xwe ya yekemîn li dar xist. Kongre di rojê ku gelê Kurd li Almanayê di serhildaneke girseyî de bû pêk hat. Girseyên gel li bajarê Bonnê li dijî hovîtiya faşîstên Tirk û piştgirên wan împeryalîstên rojava diqirîyan. Bêdengiya li ser qirkirina gel bi bangên xwe diçirandin. Di vê rojê de mamosteyên Kurd kongreya xwe ya yekemîn birêve dibirin û bi serkevtinî dawî lê anîn. Kongreya YMK ya yekemîn bi kêliyeke bêdengiyê di rêzdariya şehîdan de dest pê kir. Rewşa siyasî ku gelê Kurd tê de ye bi firehî hat nirxandin. Rapora kar û barên komîsyona amadekar hat xwendin û li ser gengeşî hatin kirin. Destûra yekîtiyê hat xwendin û ji hêla kongreyê ve hat pejirandin.

Kongreya yekîtiya mamosteyên Kurd "YMK" ku dibin van dirûşmeyan de li dar ket: "Qîra Serxwebûn û Azadiyê ji nav lêvên zarokên Kurdistanê der tê" û "Em zarokên xwe ji pişavtinê biparêzin". Di komcivîna xwe de gelek biryarên heja standin. Ji van biryaran:

1- Amadekirin û çapkirina pirtûkên dibistanan ji bo hemû pûlan 2- Li her herêmên Almanyayê, avakirina yekîtiya malbatên Kurd 3- Hilbijartina şehîd Hemza mîna serokekî manewî ji bo yekîtiyê 4- Birêvebirina planekî xebatê ji bo amadekirina mamosteyên Kurd 5- Vekirina kursên zimanê Kurdî li hemû herêmên Almanyayê 6- Kongre van mesajan dişîne:

- Ji bo serokê gelê Kurd yê neteweyî, serok Apo - Ji serleşker û şervanên Artêşa Rizgariya Gelê Kurd ARGK'ê re - Ji bo hemû rêxistin û partiyên Kurdistanî - Ji bo Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistanê YJWK - Ji bo mamosteyên Kurd li Başûrê Kurdistanê - Ji bo mamosteyên zanîngeha Selahedîn li Başûrê Kurdistanê.

Ji bilî van mesajan jî yekîtiya mamosteyan wê daxuyaniyekê ji bo hemû şexsiyet û desgehên siyasî û mirovahî re belav bike. Di daxuyaniyê de wê qirkirin û hovîtiyên ku di Kurdistanê de tên kirin şirove bike.

Di dawîya kongreyê de komîteyêke navendî ji bo ji rêvebirina kar û barên yekîtiyê hat hilbijartin.

Berpirsiyarê Özgür Gündemê hate girtin

Berpirsiyarê rojnameya Özgür Gündemê Erkan Aydın, ji hêla Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê ve hate girtin.

Dadgehê, ji bo Aydın 16 da-we vekir û di van 9 daweyan de biryara girtina Aydın hate dayîn.

Ji hêla din rojnameya Özgür Gelecek, ji hêla Dadgeha Cezayê ya 2. ya Stenbolê ve hate girtin. Girtina rojnameyê bi daxwaza Emniyeta Stenbol pêk hat.

Kovara İşçinin Yolu jî, ji hêla Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê ya numreya 1 ve, ji bo 15 rojan cezayê girtinê stand.

Li milê din berpirsiyarê Kovara Newroz Ateş Nedîme Tunç, di hejmara 6 de, ji ber ku nivîsên bi navê, "Pêşgotin", "Şoreşa Kurdistan û Çepê Tirkîyeyê" û şîroveya "Buroya Çapemeniyê yê KAWA", weşandine, mehkûmî 6 meh cezê girtîgehê û 50 milyon jî cezê pera bû.

Kemal Bîlget jî girtin

Cîgirê Serokê Partiya Demokrasiyê (DEP) Kemal Bîlget, ji hêla Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê ve, bi sîcê, li dijî Qanûna Komara Tirkîyeyê (TCK) benda 146'an, ku bi daxwaza idamê dikare bê darizandin, hate girtin. Wek tê zanîn, di hefteya borîn de rojnameya Welat dabû diyarkirin ku 'Kemal Bîlget wînda ye'. Lê, li gor agahiyan Kemal Bîlget niha li girtîgeha Bayrampaşa ye. Li gorî ku parêzkarê wî (ebûqat) Türkan Kurtulmaz, dibêje, dixwazin Kemal Bîlget, ji ber daweyên kevin di sa bidarizandin. Kurtulmaz jî wiha dibêje: "Ew dosyaya me (Daweya TKEPê-Partiya Ked a Komünîst a Tirkîyeyê) ji zû ve hatiye dadan."

Kovara Ognî hate komkirin


Kovara çandê ya Laza, ji hêla Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê ve hate komkirin. Li gor biryara DED (DGM)ê ya 2 numre, ev kovar, ji ber Qanûna Têkoşîna bi Terorê ve benda 3 ve hatiye komkirin. Ev kovar li ser pirsgerêka çanda Laza û zana-wa wan dirawestî. Berpirsiyarê Kovarê M. Barış Beşli, der heqê wê biryarê de ev got: "Biryarek ne di cih de ye."

Hedefên PKK'ê yên sala 1994'a

Navenda Nûçeyan- Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) Abdulla Öcalan, ji bo zivistanê û bi pirranî jî, ji bo rapêrîna Bihara 1994'an, talîmatek ji kadro û şervanan re şand.

Di axaftina Öcalan de tê diyarkirin ku hemû dezgehên di xizmeta dewletê de ne wê bibin hedefên PKK. Li gor Öcalan: "Di nav vê çarçewê de; partî, çapemenî, perwerdeyî, tenduristî û dezgehên din jî hene."

"Partiya Refahê, di demên nêzik de bi alîkariya artêşa Tirk re, li hemberî gelê Kurd siyasetek bi sextekarî bikar tîne?" dibêje Öcalan û wiha berdewam dike: "Emê bi awakî tundî biçin ser Partiya Refahê û bi têkoşîna xwe, planên vê Partiyê xira bikin."



Öcalan: "Ji bo 'Şerê Taybetî' kîjan rê û qanalê aborî xizmetê bike, wê ew ragihandina na jî bête girtin."

Ji hêla din di talîmatê de tê diyarkirin ku: "Ji xeynî van dezgehan, BOTAS jî wê bê tasfiye kirin. Heke hewceyî pê bibe, rayedarên

vê dezgehê jî dibe ku bibin hedefa PKK."

Di talîmatê de Öcalan, li ser pirsgerêka ragihandina Kurdistanê jî wiha dibêje:

"Ji bo 'Şerê Taybetî' kîjan rê û qanala aborî xizmetê bike, wê ew ragihandin li şerê taybetî re jî bête girtin."

Amadekariya kongreya DEP'ê didome

Navenda Nûçeyan- Rayedarên DEP'ê (Partiya Demokrasiyê) ji bo kongreya duyemîn ya awarteyî ku dê di roja 12'ê Kanûnê de çêbibe amadekariyê dikin. Ji niha ve du kes ji bo serokatiya giştî bûne berendam. Ev kes, Mebûsê Amedê Hatîp Dicle û Mebûsê Pirrîne Mahmût Kiliç in. Serokê partiyê Yaşar Kaya ji ber ku girtiye, nebû berendam, heke heta kongreyê bê berdan, dê ew jî bibe berendam.



Herdu berendaman dest bi gera xwe ya li ser serokati û delegeyên hinek bajaran kirin. Mahmût Kiliç roja

24'ê Mijdarê li Edeneyê derheqê xebatên amadekariyê de agahî dan çapemeniyê. Kiliç di vê daxuyaniya xwe de got ku, pirsgerêka herî girîng li Tirkîyeyê pirsgerêka Kurdî ye û sedemê çaresernebûna vê pirsgerêkê jî MGK (Lijne Ewlekarî ya Dewletê) ye. Kiliç îdia kir ku, Çiller bi MGK'ê re li ser hinek mijaran (aborî, ramyarî) li hev rûniştîye û wan li hev kirine. Hatîp Dicle jî li avahiya DEP'a Dilokê ji bo çapemeniyê civînek çêkir.

Di vê civînê de di gel amadekariyên wan ji bo kongreyê, Dicle daxuyand ku, daxwaza wan a pêşîn şerwestandina du aliyên û aştî ye.

Serokên DEP'ê yên hinek bajaran ku ji bo kongreya awarte hatibûn Endereyê jî, wiha gotin: "Divê partiya me ji bo hemû mirovên kedkar kar bike û bibe partiya hemû mirovên jar û bindest, partiya me ne tenê partiyan Kurdan e, partiya kedkarên Tirkîyeyê ye jî".

Bisîklêt bê Berzan ma

Navenda Nûçeyan- Turgut Berzan Kahraman, zarokê Kurd (ji Qoser navçeya Mêrdîne) 12 salî ye. Ew, niha wek gelek

nîşên xwe, mirî ye.

Li Kurdistanê jiyana rojane, cihê xwe ji jiyana hovanê re hiştiye. Êdî zarok jî, dibin hedefa şerê qirêjî.

Berzan li sikakê (ji ber tunebûna cihê lîskê) bi hemsalê xwe re dilîst. Panzerek, tê de mirovên bêhis zarokên ku ji xwe re dilîstin, raste rast didan ber gulleyan. Hew gullebarandina mezinan, gundan û bajaran têra hineka nedikir.

Gelo ew kesên zarokar, dide ber gulleyan, hezkirina zarokan ji dilê xwe avêtibûn. Lê wisa xuya ye ku ji xeynî hezkirina zarokan, peyva hezkirîna jî van dilan bar kiriye.

Berzanê welêt, ne tenê di lîska de tîn kuştin, lê



Berzan bi gulleya panzêra timên taybetî hate kuştin.

belê ew di zikê diya de, li ber şîr û çiptazî, di her warê jiyandê de, tîn kuştin.

Niha bisîklêt bê Berzan maye. Lê lîska zarokan, her dom dike.

ÖZDEP girtin

Dadgeha Qanûnê Bingehtin bi sîcê "cudaxwaziyê", Partiya Azadî û Demokrasiyê (ÖZDEP) girt. Serokê Dadgehê Yekta Güngör Özden da zanîn ku biryara girtinê, ji ber hin sedemên ku di bernameya partiyê de hebûn, hatiye dayîn.

Weke tê zanîn di hîlbijartinên dawî de mebûsên HEP'ê di SHP'ê de cih girtibûn. Lê careke din biryar dabûn ku ÖZDEP ava bikin û bi navgîna vê partiyê derbasî HEP'ê bibin.

Di têkoşina neteweyî de serpehatiyêke rasteqîn

Gerîla û rewşa Metika Seyro

Nûşer Dilan

Şeverêş e. Bayê kurr mîna cilêta tûj e, dev û guh li wan dişewitîne. Hêstir (rondik) şeşe şeş ji çavên wan têne xwarê. Beledî (birûsk) vedibin. Şewq û lêlanê bi hawîr dixin. Gurme gurma tavan, guh li mirov kerr dike. Ne bi tuwî baranê dest pê kir. Mirov dibêje qey esman qul bûye.

Pênc gerîla mane di nav herî û taqan de. Cilên wan ji şilayiyê bûne mîna risasê. Ev sê saetê wan e ku, bi rê de ne. Heta lingekî xwe ji nav heriyê dertînin, lingê din heta bi kabokê di nav heriyê de diçike. Lê biryara ku dan û peywira ku wê bi cih binin, pirr girîng e. Ji bo vê yekê rawestîna û betilandin nayê bîra wan. Sê dan li wan borîne ku, tiştê nexwarine. Êdî ji aliyekî herî û baran, ji aliyê din ve ji birçibûn.

Bi wê rewşê livbaziyeke mezin pêk anîn. Peywira xwe bi cih kirin û li piyê paş vegeyan. Li vegeyê, riya xwe guhertin. Hem ji bo dewsa wan xuya nebe û hem jî, ji bo xwe ji heriyê biparêzin. Berê xwe dan kaşekî û tibare, tibare meşîyan.

Qeremê wan qut bûn. Carina xwe diavêjine erdê û bi çarlepkan dimeşin. Gerdûn li dora wan dizivire. Bi kote-

kî xwe gihandin nivê kêş.

Piling li wan vegeyîya û got:

-Gelî hevalan! Zehmetiya me heta serê kêş e. Êdî serjêrek e. Li wî aliyê kêş gundekî welatparêz heye. Emê li wir xwarin bixwin, dû re ji xwe bigihînin parêzgehê.

Di sa rabûn û bi hewlekê li ber xwe dan. Gihane serê kêş û bêhna xwe vedan. Bistekê xwe rihet kirin. Dû re rabûn û xwe di kêş re berdan. Gihane keviya gund û berê xwe dan mala pêşîn. Piling destê xwe li derî da û sekîni. Tu pêjn nehat. Careke din bi şid destê xwe li derî xist. Dengê pîrekekê ji hundir hat:

-Ew kî ye?

Piling bi dengê nizm got: "Em in!.. Em heval in. Ma ev mala kê ye? Ka derî vekin."

Pîrekê got:

-Ez Seyro me. Mêrê min ne li mal e. Ez û zarokan bi tenê ne.

Piling:

-Meta Seyro, em ne yê rûniştîne ne. Ka derî veke.

Seyro mifteya darîn li derî da. Destê xwe da bi şiraban û şûrik kişand. Çawa derî vebû, her pênc gerîla gurr bûne hundir. Li der û dorê xwe nihêrtin. Du dest nivîn li rexê rastê danîbûn. Çar-pênc zarok bi ser hev ve seroqûno, di nav wan de

Pênc gerîla mane di nav herî û taqan de. Cilên wan ji şilayiyê bûne mîna risasê. Ev sê saetê wan e ku, bi rê de ne. Heta lingekî xwe ji nav heriyê dertînin, lingê din heta bi kabokê di nav heriyê de diçike. Lê biryara ku dan û peywira ku wê bi cih binin, pirr girîng e. Ji bo vê yekê rawestîna û betilandin nayê bîra wan. Sê dan li wan borîne ku, tiştê nexwarine. Êdî ji aliyekî herî û baran, ji aliyê din ve ji birçibûn.



razayî bûn. Sobeyeke zingargirtî û derîkê wê yê riziya li nivê holê bû. Piling bi nermahî:

-Metika Seyro, em gelekî birçîne. Hema ku çi biqede emê bixwin û herin

Seyro deng nekir û çû odeya din. Demeke xweş bihoftî û pêjna wê nehat. Medya rabû ser xwe û li dû çû odeya din. Çawa kete odayê, devê wê ma ji hev. Nihêrt ku tiştê sifî û kevîşkêstî li nivê rastê ye. Çend tepsî û beroşeke bafûncî i kevin di hundirê sêlikê de ye. Meqilkek û moxilek bi hêt ve daleqandî ye. Tu tiştên din jî xuya nakin.

Seyro li ser qelêvîzkan rûniştî ye. Piştî xwe daye hêt. Serê xwe kiriye nav destên xwe û bêdeng hêstiran dibarîne. Medya, cilika testê da alî û mêze kir. Nan û çeniyeke hişk tê de bûn. Li Seyrê vegeyîya û ber pê çû. Rahişte herdu milên wê û rakire ser piyan. Bi meraq got:

-Mêrê te li ku ye? Tu û zarokên xwe çi dixwin?

Seyro weke aveke ku bipingîhe û bi derekê ve biteqe, sînga wê çû û hat. Giñ rê nedayê ku zûka bersiv bide. Dû re got:

-Keça min! Ev du heyv e ku, mêrê min çûye Edenê. Lê li gorî xeberên ku tînin ji me re, rojekê kar dike, sê rojan vala ye. Ji aliyê din ve jî xwedîkar dibêjin: "Hûn Kurd xayîn in. Herin bila A-

po kar bi we de".

Medya keserek berda û got:

-Baş e, hûn çawa dikin?

Seyro:

-Em bi alîkariya gundî û ci-ranan debar dikin.

Medya xwe hew girt, bi hêrs got:

-Herê Metika Seyro. Ma em ji bo çi li çiya ne? Ji bo çi em di bihara emrê xwe de, xwe dixin bin erda sar û beridî? Ma ne ji bo wî gelê şepirze, hejar ku bi hezaran salan dîl û bindest e? Gelo em jî naxwazin weke ciwanên gelên dinyayê bibin xwedî mal, zarok û jiyaneke xweş? Lê na Metika Seyro!.. Heta ku rewşa jiyana me ev be, emê jî li çiya bin...

Medya çû odeya ku hevalên wê lê ne. Bi xemgîni got:

-Hevalê Piling, ka çi dirav (pere) bi te re hene?

Piling xelitka çermîn derxist û got:

-Sêsed û pêncî hezarê ka-xez hene.

Medya:

-Ka sêsedî ji wan û rabin em herin. Medya sêsed hezar pere da destê Seyro. Bi lez derketin û gund bi şûn xwe ve hiştin.

Bang ji bo Meşa Azadiyê

Rûmeta mirovahiyê ya ku gelê Kurd bi berxwdana xwe ya bêrawestîna diparêze,

li dijî metingeriya dewleta Tirk û artêşên wê yê hov, ên ku bi sed-salan e mirovên Kurd dikin kole û kesitiyan wan didin bin piyan, wê bi ser keve.

Bi vê bîr û baweriyê em bang li hemû rewşenbîran dikin ku beşdarî Meşa Azadiyê ya YRWK (Yekitiya Rewşenbîrên Welatparêz ên Kurdistanê) ê ku, ji Parlemantoya Almaniyayê heta Parlemantoya Ewropayê ango Ji Bonnê heta Brûkselê ye bibin.

-Komîteya Meşa Azadiyê-

* Meş wê di 23'yê Qanûnê de li ber Parlemantoya Bonnê dest pê bike û di 4'ê Çileyê 1993'yan de dê li Brûkselê li ber Parlemantoya Ewropayê biqede. Kesên dixwazin beşdarî Meşê bibin, karin serî li vevê navnîşanê

bidin: YRWK,

Maxstir. 50-52 53117 Bonn.



Tu xwedanê şûrekî tûj, ez yê zimên im. Cudahiya navbera herdu şûran mîna erd û asîman e.
Şêx Rîza Telebanî

'Bixeniqînin beriya ku diya wî bigihîjê'

Li payîtexta Iraqê, Bexdayê zilamekî Kurd û yekî Ereb ji ber hin sûcên giran hatibûne girtin û li dadgehê ji bo wan biryara dardekirinê hatiye standin.

Roja ku dê bêne dardekirin, li ber sêpiyê ji wan daxwazên wan ên dawî tê pirsîn. Yê Ereb dibêje:

-Ez dixwazim beriya ku bimirim diya xwe bibînim.

Dor tê ser ê Kurd. Jê eynî pirsê dikin. Zilamê Kurd vê daxwazê ji wan dike:

-Ez jî dixwazim, beriya ku diya wî bigihîjê, ev zilam bê dardekirin!...



Cotkarê Sovyetî

Beriyê hilweşîna Sovyetê, cotkarek Rûs cara yekemîn ji gundê xwe derdikeve û diçe Moskovayê. Jina cotkar beriya ku mêrê wî bi rê bikeve, jê nanê bajêr dixwaze. Cotkar li Moskovayê piştî ku karên xwe xelas dike, diçe meydana sor ku

xwesteka jina xwe pêk bîne. Li meydana du rêz hene, yek jê ya nan e û ya din jî serlêdana mozoleya Lenîna e. Cotkarê me bi şaşî dikeve rêza serlêdana mozoleya Lenîna. Rêz gelek dirêj e û heta ku dor tê ser cotkar 5-6 saet derbas dibin.

Cotkar piştî ku vedigere gundê xwe, jina wî jê pirsana nanê bajêr dike. Bersiva cotkarê reben wiha ye:

-Heta ku dor hate ser min û min xwe gihande cihê nanbelavkirinê, ew mirovê ku nan belav dike miribû!...

KÊ ÇI PEKAND?

Hîna ku mar biçûk e divê serê wî bê perçiqandin.

(Mamosteyekî Tirk li Kurdistanê)

Pêkeniyên dora Midyadê

ÇILO REHMETIYÊ BAVÊ TE

Êvar diz kete mala yê Halexî. Mêvanê wî gelek li ber xwe ket. Serê xwe hejand û got: "Herê em şiyar nebûn. Baş e ma seyê we qet dengê xwe nekir?"

Xwediyê malê bi xemgîni got: "Na bira. Çilo rehmet yê bavê te di tîrbê de got kewt, seyê me ne got hewt.."



MA ŞÊX KER E?

Şêx hate Halexê. Gund bi carekê çûne tewafa wî. Mizgeft bi carekê tije bû. Piştî tewafê yek rabû kuî here. Lê li şekalan (sol, pêlav) nêrî ku, hemû tevlihev bûne. Dengê xwe hilda û got: "Vêca emê çawa şekalên xwe ji hev nas bikin?"

Yekî ji wî alî got: "Çima, ma şêx ker e wan ji hev nas neke? Ma şêxê çî ye?..."

Keçel û Berber

Roşanê Heciyan nîzdîk biyo. Yew keçel zî hedireya roşanî kenno. Serê seredê Keçelî heme rût biyo, tenê çêher tûmî por diyardê seredê jê ya mendo. Por tenê dormedê seredê jê ya esto. Weser o. Roşanî rê yew roj mendo. Yew rojedo şiliya. Şilî şepelî çiman nêakena. Keçel şan ra fikiriyeno ki nimajê şoro berber. Ki beno nimaj, keçel sêparê xwi weno. Ki sêparê xwi werd qedêna, cenîda xwi ra vano:

- Keynê ay qunderanê mi besteri ez şona sûki. Ceniya jê qunderanê jê bank kena ana jê ver di ronena. Keçel keye ra vejyeno raşt ver a xwi dano sûki. Senî ki sûk resen o, şono dikandê berberî. Keçel bar akeno şono zere selam dano. Berber silama jê ragêno. Keçel yew kursî ser o roşeno berberî ra vano:

- Berber efendî, ez hama porê xwi biqesna. Çend mêrdimî mi ra ver estê? Berber keçelî ra vano:

- Xalo, ez porê enê xortî safî ka. Ki mi safî kerd naba to ya. Ez porê to qesnena. Keçel vano:

- Başo. Nabên ra zaf nêromeno berber porê xortî safî keno. Xort ki heqê berberî da xatir waşt û dikan ra teber kewt. Berber Keçelî ra vano:

- Xalo, bê nêba toya. Keçel kursî sero roşeno. Berber pêşmala porqşnayîşî fineno dormedê viyedê jê û dest bide kenno porê jê qesneno. Berberî ki porê Keçelî safî kerd, Keçelî ra vano:

- Xalo, ez porê to kam kiçta tiroka. Keçel vano:

- Di tûma ena kişta, di tûma a kişta tiro biki. Berber senî ki porê Keçelî tiro keno, çêher tûmana yewê rişena. Berber Keçelî ra vano:

- Xalo, tûm a yew rişay, mendi hîrê tûmî. Ez enî ra kam kişta tiro bika? Keçel vano:

- Yew tûm kişta çep ser o tiroki, ay di tûmê ki mendê zî kişta raşt ser o tiroki. Berber vatişê Keçelî ano ca. Berber senî ki dest bide keno porê Keçelî tiro keno, yewna tûm a pordê jê rişena. Berber Keçelî ra vano:

- Xalo, Mi tiro kerd. Feqet yewna tûm a pordê to rişay. Mend di tûmî, ez ena hew porê to senî tiro bika? Keçel vano:

- Yew tûm ena kişta yew tûm a kişta. Berber vatişê Keçelî ano ca. Berber senî ki şane fineno bide ki porê Keçelî tiro biko, tûm a bîni zî rişena. Berber Keçelî ra vano:

- Xalo, porê to hîrê tûmî rişay, mend yew tûm. Ez porê to kam kişta tiro bika? Ena ray Keçelî bi hêrs vano:

- Ti kam kişta tiro keno, tiro biki. Kêfê to yo hêdîna.

Mihem Himbêlij

Jûjî...

Doğan Güzel



Hewldana zindîkirina Hemîdiyan

Dewlet bi civîna 12 serokeşîrên Kurd ên ceş dixwaze li hemberî Kurdan şerekî pis î gemarî bimeşîne û Kurdan bi sîng bispêre hev. Ev siyaset di dema Osmanî de bi Alayên Hemîdî hatibûn pê û gelek Kurd û Ermenî hatibûn qetilkirin.

Tirkiyeya ku bi pergala parêzvaniya gund li hemberî PKK'ê bi ser neket, vê carê dixwaze bi rêxistinkirina eşîran, çekdarkirina wan bigihîje armanca xwe û di reşê wan de Kurdistanê bike gola qetilxwînê.

Navenda Nûçeyan- Rojeva vê heftiyê civîna bi 12 serokeşîran re bû. Dewletê, bi hemû îmkanên xwe yê ragihandinê ve propagandeya vê civînê kir. Bi rengê ku ev eşîr li dijî "zilma" PKK'ê derketine û dixwazin aliyê dewletê bikin. Lewma hatine Enqerê ji rayedaran çek û alikariyê dixwazin.

Lê tiştek heye, dîsa dixwazin Kurd bi destê Kurd bikujin û wek di minaka Alayên Hemîdî de Kurdan berî hev bidin. Ev ji hebû ku ev serêlên Kurd ên xî-niz jixwe li dijî PKK'ê rahiştibûn çeka dewletê. Lê dewlet dixwaze dîsa rihê Alayên Hemîdî vejîne, Kurdistanê bike cihê kuştinê. Me xwest vê siyaseta kevin ku ji dema Osmanîyan ta niha li ser Kurdan tê meşandin kurt be ji deynin ber çavan.

Cihêrengiyên civaka Kurdî her tim ji bo dijminên wan bûne alet û ambûrên birêvebirina wan. Cudahiyên olî, mezhebî, êlî, herêmî, siyasî û hwd. ên gelê Kurd tim dêhna dewletên herêmî yê dagirkerên wan kişandiyê ser xwe. Ev rewşa gelê Kurd doh ji aliyê dewleta Sefewî û Osmanî ve, îro jî, ji hêla Îran, Iraq, Tirkiye û Sûriyeyê ve tî bikanarînin.

VEQETÎNE BI RÊ VE BIBE

Dagirkirina Kurdistanê ji aliyê dewleta Osmanî ve piştî Şerê Çildêranê (1514) -ku di navbera Sefewî û Osmanîyan de li Kurdistanê pêk hatibû û bi alikariya eşîrên Kurd ên Sûnî ve Osmanî bi ser ketibû- siyaseta "veqetîne û birêve bibe" serdest bû. Padişahên Osmanî li Kurdistanê ta dema Abdulhamîd bi awayekî nehênî (veşarî) azîneya (metoda) Nicolas Machiavel li ser êlên Kurdistanê pêk anîne. Li gorî Machiavel ku di sedsala 15'an de li Floransa İtalyayê jiyaye û ji bo birêvebirina desthelatê pirtûk ji fermandarên demê re nivîsiye, divê hêzên serdest ji bo zeximandin û domandina desthilata xwe hêzên dijberî xwe ji hev parçe bike û li hemberî yê mezin piştvanîya ya qels bike. Lê hêza ya biçûk divê ku mezin

neke û wan berî hev bide.

Osmanîyan ta dawiya sedsala 19'an li Kurdistanê ev siyaset meşandin û Kurdan di bin destê xwe de hiştin. Lê di pey hişyarbûna netewe û hindikahiyên di nav sînorê dewleta Osmanî de, padişahan stratejiya xwe guhart û dest avête gelê Kurd ê ku ji aliyê hest û hişê neteweyî ve ji paş ve ma-bû.

ALAYÊN HEMÎDÎ

Padişahê Osmanî Abdulhamîd ji bo xurtkirina hêza Tirk û parastina dewletê Alayên Hemîdî da avakirinê. Avakirina Alayên Hemîdî ji aliyê Mifetîşê Artêşa Çaremîn M. Zekî Paşa ve di sala 1891'an de hate pê.

Abdulhamîd di pirtûka xwe ya bi navê "Hatıralarım" (Bîranînen min) de ku di sala 1984'an de ji aliyê "Dergah Yayınları" ve hatiye weşandin, wiha dibêje: "Li Rûmeliyê, nê-maze li Enedolê ji bo xurtkirina Tirkan berî her tiştî şert e ku em Kurdan di nav xwe de vestrînin û ji xwe re bikine mal".

Ji gotinên padişah tî derxistin ku armanca wan ew e; Kurdan di nav xwe de bihelînin, bibişevînin û wan bidirûvînin xwe. A din jî wan ji bo xurtkirina hêz û desthelatiya xwe bi kar anîne. Bi vê mebestê li Kurdistanê rêxistinên eşîran ji du milan ve hate pê û milê yekemîn nêzikî sînorê Rûs, li Erzerom û Wanê, a din jî li Mêrdîn û Ruhayê. Hejmara Alahiyên Hemîdî li gorî salan guheriyê û ji 36'an ta 65'an derketiye. Her alahî jî, ji 1200 kesên siwarî pêk dihat.

Alahiyên Hemîdî li Gumgumê (Varto), Kanîreşê (Karliova), Kop (Bulanik), ji Êla Cibranan 4, li Melazgirê ji Eşîra Hesenana 6, li derdorê Xînusê 3, Li Wêranşarê ji Êla Milan 6, li herêma Sîrûsê (Suruc) 3, Li hawirdora Patnos û Muradiyeyê 3, ji Agirî, Zilan, Celalî û Heyderan jî her yekê dudo hatine sazîkirin.

DIBISTANA EŞİRAN

Piştî avakirina Alahiyên Hemîdî li Stenbolê paytexta Osmanî, ji bo zarokên serokeşîrên

Kurd Dibistana Eşîran (Aşîret Mektebî) vebû, di 1892'an de. Armanca avakirina dibistanê ew bû ku lawên serokêlan li gorî daxwaz û armancên Osmanî bîne hêvotin û meşandin siyaseta Osmanî ya nû li ser gelê wan bi destê wan. A din jî kontrolkirina êl û eşîran û rêlibergirtina serhildanan bû.

Dema em armanca avakirina Alayên Hemîdî û dibistanê bidin ber çavê xwe, em dê bibînin ku di binê wan de jihevveqetîna gelê Kurd bi destê eşîran heye, kuştina bira bi destê bira, pêşkarkirina Kurdan li hemberî Ermenîyan. Em dikarin mebest û hedefa Osmanî der barê birêxistina pergala Alayên Hemîdî de wiha bi rêz bikin:

1-Berîhevdana Kurd û Er-

menîyan. Wek di "Terqa" Şêx Seîd de dewleta Tirk ji eşîrên Mûşê yê Gumgumê (Varto) Hormek û Lolan bi kar anîn. Lê di pey şikandina serhildanan de ji bîr nekir ku geranê xwe li serê wan bide.

Ji aliyê din ve ji bo helandina Kurdan û inkarkirina hebûna wan her politikaya xwe domandin û ji xwe re êl, eşîr, şêx dewlemendên Kurd peyde dikir, ew di bin perr û baskên xwe de xwedî dikirin. Ên ku bêhna welatparêziyê jê bihata, ji zilm û pêkûtiya dewletê nedifilîtin; kî dibûn bila bibûna.

PERGALA PARÊZVANIYA GUND

Dewleta Tirk li Kurdistanê tim hebûna xwe bi destê serokeşîr, şêx, dewlemendên Kurd

reyên şerê qirêjî û cinayetên "kiryar nediyar" dewlet nedigihîşt armanca xwe. Vê carê dest avête eşîrên ku berê di nav wan û PKK'ê de şer qewimîbûn. Li Siwerekê bi destê Eşîra Bucakan xwest tiştina bike. Li deverên Ruhayê bi destê Wezîrê Dewletê Necmettîn Cevherî ku ji Ruhayê ye û ji malbata şêxan e, serkêşiya vî tiştî kir.

Pêgerînen dewletê naqedin. Niha jî hêviya xwe bi çekkirina eşîrên hevalbendên xwe ve girê didin. Mijara anîna serokên eşîran a Enqerê, rojeva rojnameyan û siyasetvanan dagirt. Çar roj li ser hev serokên 12 eşîran ku bi xwe cerdevaniyê (çetevaniyê) ji dewletê re dikin, li Enqerê ezimandine û wan bi Midûrê Giştî yê Emniyetê Mehmet Açar, Fermandarê Giştî yê Jendermeyan Orgeneral Aydın İltîr, Wezîrê Karê Hundirîn Nahît Menteş û rêvebirên mezin re dane nîşandan. Pişt re bi Serokwezîr Tansu Çiller û Serokkomar Demîrel re jî dane naskirin.


Serokên 12 eşîrên hêviya Tirkiyeyê, derketin manşetên rojnameyan û di televîzyona dewletê de qatîlê 7 jendermeyên Tirk Tahir Adiyaman bi Kurmancî jî peyivandin.

Serokên eşîran ev in: Ahmet Zeydan (Eşîra Pînyanîş), Hakki Türe (Eşîra Beyzadeyan), İskender Ertuş (Serokê Eşîra Şerefxanan û Nûnerê Eşîra Ertoşan), Abdurrahman Özbey (Eşîra Ezdînan), Abdurrahman Şeylan (Eşîra Alan), Hazim Babat (Eşîra Babat), Tahir Adiyaman (Eşîra Jîrkî), Kamîl Atak (Eşîra Tayan), Osman Demîr (Eşîra Batvan), Ramazan Çetîn (Eşîra Erebiyan), Dilbaz Encû (Eşîra Mendkan).

Wisa beyan kirin ku ev eşîr dixwazin aliyê dewletê bikin û li dijî PKK'ê şer bikin. Her wiha ji wan çekên mezin û giran wek roketavêjê xwestine. A din jî dan diyarkirin ku ev eşîrên ku ji herêma Botanê ne, ji milyonekî bêhtir nifûsa wan heye û di hîlbijartinên herêmî de ji bo belediyan wê aliyê dewletê bikin.

Di rastiye de tiştek din heye. Ev serokeşîrên ku anîne Enqere û bi wan re ji bo "qelandina PKK'ê" civîn çekirine, jixwe di serî de di milê dewletê de ne. Nifûsa ku di bin destê wan de heye ji 10 hezarî ne zêdetir e û jixwe cerdevanê dewletê ne.

Gava em li meseleyê baş binîhêrin wê bê dîtin ku dewlet li pey kuştina gelê Kurd e, bi destê eşîran. A din jî dixwaze di bin siya wan de qetlîaman li Kurdistanê pêk bîne û xwe li hember raya dinya û Tirkiyeyê bêsûc bide nîşan.



Alayên Hemîdî di qirîkirinên Kurd û Ermenîyan de ji aliyê Osmanî ve gelek car hatibûn bikanarînin.

menîyan

2-Bendkişandina li dijî êrişêke Ûris a muhtemel ku ji Qafqasê were

3-Rûxandin û xerakirina îtîfaqa Kurdan û berîhevdana wan

4-Îslamkirina Ermenîyan an jî koçberkirina wan bi destê Kurdan

Bi navê dîne Mihemed û Xelîfeyê İslamê Abdulhamîd ev dek û dolabên xwe li ser Kurdan pêk aniye, gelê Kurd ê Êzîdî û Ermenî bi destê wan qirîriye, pişt re wan bi sîng spartiyê hev û xwe wek "Bavê Kurdan" bi awayekî şalûzî bi wan daye pejirandin.

SIYASETA OSMANÎ BERDEWAM E

Komara Tirkiyeyê jî fên û dolabên ku Osmanî li Kurdan dikir ji bîr nekir. Di serhildanên Kurdan de eşîran bi xap û bi dek ber bi xwe ve kişand û ew

ên xwefiroş, xîz û hevkarên ve domandiye, zeximandiye. Ji bo xwe ango ji bo birêvebir, wezîfedar, sîxûr û hwd. ên li Kurdistanê pirtûk, biroşûr, xebatên li ser rengê civaka Kurdî çekirine û li gorî xwe hevalbendên dewletê û yê ne dewletê dane nîşan.

Hilpişkîna 15'ê Tebaxê kir ku komara Tirk hevalbendên xwe yê li Kurdistanê derxe ronahiyê tevî siyasetvan û eşîran. Bi xurtbûn û bilindbûna têkoşîna çekdarî ya PKK'ê ku ji bo Kurdistanê azad û serbixwe tîdikîşe, dewleta Tirk ket pey çareyan. Ji xwe re ji nû ve giyana Alahiyên Hemîdî vejan-din. Di sala 1987'an de li Kurdistanê dest bi birêxistina pergala parêzvaniya gund kir û li hemberî PKK'ê ew bi çek kirin.

Ev siyaseta ku kuştina bira bi destê bira dixwaze, zêde li hemberî PKK'ê xwe ranegirt û bi ser neket. Di gel hemû cu-

Dewletê Kurdî pejirand

Navenda Nûçeyan- Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê (DED) der heqê rojnameya me de doza girtinê vekir. Doz roja 31'ê Çileyê 1994'an wê li DED'a Stenbolê li dar bikeve. Teblîxata ku roja 1'ê Mijdarê ji aliyê Dozger Mehmet Demircî ve hatiye amadekirin, roja 25'ê Mijdarê gihîştê destê me. Di teblîxatê de daxwaza biryara cezakarîna Berpirsiyarê Nivîskaran yê Welat Mazhar Günbat û girtina rojnameya Welat tê kirin. Di teblîxatê de tê îfadekirin ku du nivîsên di hejmara Welat a 73'yan de hatibû weşandin ji aliyê tercûmanek sondxwarî ve hatine wergerandin û tê de gelek niqteyên ku suçê teşkil dikin hatine tesbîtîkirin. Dîsa tê gotin ku bi wan her du nivîsan rojnameya Welat yekeriya (yekparetiya) dewleta Tirkîyeyê ya nayê parçekirin, xistiye xeterê û ji ber wê yekê daxwaza doza girtinê ji bo Welat pêwîstî hatiye dîtin.

Di vê teblîxata ku bi destê rayedarên Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê hatiye amadekirin de, peyva "zimanê Kurdî" derbas dibe. Hebûna vê nivîsê nîşan dide ku bi awayekê îndîrektî jî be dewlet hebûna zimanê Kurdî bi devekê fermî dipejirîne. Ji ber vê yekê, her çiqas ev teblîxat bi mebesta girtina rojnameya Welat hatibe amadekirin jî, li aliyê din yekemîn car e ku peyva zimanê Kurdî di nivîseke fermî ya dewletê de dide xuyakirin.

Heta niha gelek caran ve dadgehê der heqê nivîs û helbestên Kurdî de dozên darizandinê vekiribû. Lê ji ber ku ew nivîsar bi Kurdî bûn ew doz vekiribûn û tu car jî wan nivîsan re nivîsên Kurdî nedigotin. Heta îro, dema saziyên dewletê behsa zimanê Kurdî dikirin, ne digotin Kurdî digotin

Ji roja ku rojnameya me derketiye ta niha ev yekemîn car e ku der heqê du nivîsên wê de doz tê vekirin. Di doza ku ji aliyê dozgerê Dadgeha Stenbolê ya Ewlekariya Dewletê hate vekirin de her wiha daxwaza biryara girtina Welat jî tê kirin. Di teblîxata doza Welat de tiştêkî din ê balkêş û nû jî, nivîsandina peyva Kurdî ye. Bi vî awayî peyva Kurdî cara yekemîn de nivîseke fermî ya dewletê de derbas dibe.

"zimanekî nayê zanîn" Ji ber ku ev cara yekemîn e dewlet bi nivîseke fermî hebûna zimanê Kurdî tîne ziman, ev helwest jî aliyê siyasî ve wek gaveke girîng tê nixandîn. Tê zanîn ku, tevî ku ewçend rojname û kovarên Kurdî li Tirkîyê tîne weşandin, hê jî di Qanûnê Bîngehîn ya dewletê de peyva Kurdî û Kurdî ne hatine nivîsandin.

Ji destpêka derketina Welat ta niha der heqê Welat de tu dozên din nehatibûn vekirin. Di aliyê hiqûqî ve dozvekirina der heqê naveroka nivîsên Kurdî de ne mûmkûn e. Ji ber ku zimanekî bi navê Kurdî di qanûnên dewlata Tirkîyê de nayê îfadekirin.

Li pêşiya dewletê du astengî ango dijarî hebûn ji bo darizandinê ya Welat. Yek jê tevlihevî û şilotiya qanûnên Tirkîyeyê. Mesela di Qanûnê Bîngehîn a Tirkîyeyê de behsa zimanê Kurdî ne hatiye kirin. Zimanekî ku di qanûn de nayê xuyakirin û ji aliyê tu saziyên dewletê ve nayê hînkirin, wê jî aliyê kîjan wergêrî ve bê wergerandin? An diviya hebûna Kurdî bi awayekî fermî bipejirîne an jî wê nikaribûya Welat dawetî mehkemeyê bike.

Dijwariya duyemîn jî siyasî bû. Dewlet di qadên nav neteweyî de heta cihekî ve mecbûr maye derketina rojnameyê Kurdî serbest bihêle. Ji hêlekê

ve dewleta Tirkî bi vê tewr, xwe li rû raya giştî ya derve û ya hundir wek dewleteke demokrat pêşkêş dike, lê ji hêla din ve jî j bo ku Welat neyê firotin, her cure astengî tê derxistin, pêkutî û îşkenceyên giran li xwendevanên Welat tîne kirin. Heta gelek kes sîrf ji ber ku welat dixwînin di televîzyonan de wek sûcekî mezin pêk anîbin tîne pêşkêşkirin.

Dawî encameke wiha derdikeve holê. Welat heta îro bi rîya qanûnan nehatiye qedexe kirin, lê bi lêdan, tehdît û rêlibergirtinan dewletê di karvaniyê de ew qedexe kiribû. Ji ber vê yekê derdorên siyasî dozvekirina der heqê Welat de ji helwesta dewletê ya cotesandart a berê çêtir dibînin û vê tewrê wek gaveke fermî yekemîn a ber bi pejirandina zimanê Kurdî dinirxînin. Hin kes jî vê yekê parçeyek ji pratîka (tetbîqkirina) qanûnê nû ya li dijî terorê ku azadiya çapemeniyê jî destê wê distîne, dinirxînin. Li gor hiqûqzanan jî dewlet nikare bi vî şeklî Welat mehkeme bike, ji ber ku hê jî di Qanûnê Bîngehîn de zimanekî bi navê Kurdî tune. Ji ber vê ye di wê gumanê de dewlet wan her du nivîsên Welat wek hincet dide xuyakirin û li pey e ku bi darê zorê bide girtin an jî bi riyên normal ên hiqûqî wê gelek serê dewletê biêşe.

Ji Bonnê dengê Kurdan:

'Em jî PKK ne!'

Bonn, Welat- Roja 20.11.1993'an bêhtirî 40



Kurdên Ewropayê jî helwesta xwe bi riyên cure cure didine nîşan.

hezhar Kurd ku ji gelek bajar û welatên Ewropayê hatibûn,

rêveçûneke (meşîn) girseyî û zexim li dar xistin û helwesta hikûmeta Almanya Federal li hemberê pirsgerêka Kurdan protesto kirin.

Li ser banga Feyka Kurdistan, ku Federasyona Komeleyên Karker û Çanda Kurdî ye, li Almanya 40 hezar Kurd bi zarok, ciwan, jin û mêran ve gihîştine hev û hikûmeta Almanya bi hêrs protesto kirin.

Weke tê zanîn, piştî reaksiyona (bertek) Kurdan li hemberî sazi û dezgehên Tirkîyê li Ewropa, hikûmetên Ewropî û di serî de Almanya êrişên an-

NÊRÎNEK

Nîzamettîn Toğuç

Pakrewanî

Rojekê ji Seydayê Mele Evdîlahê Tîmoqî dipirsin, dibêjin: "Em gerîlayên xwe yê kuştî, pakrewan (şehîd) û bihuştî dibînin. Tirk jî leşkerên xwe yê kuştî, pakrewan û bihuştî dipejirînin. Tu vî tiştî çawa dinirxîni?"

Seyda wiha dibersivîne: "Bihuşt ne ya bavê me ye. Têra me û wan tev dike. Bila rojê pêncî kes jî wan bînan kuştin û bila bihuştî bin."

Pakrewanî nîrxekê guhêrbar (rolatîv) e, li gorî nêrînan wateyên cure hildigire. Û bi zehfî jî di lîteratûra gelên oldar de cih distîne. Çawa ku tê zanîn, gelê Kurd bi pirranîya xwe misilman e. Û li gorî mercên îslamiyê mirovek jî bo van tiştan ku bê kuştin pakrewan tê pejirandin. Yek; ji bo parastina giyana xwe, dido; ji bo parastina namus û xîreta xwe, sisê; ji bo parastina malê xwe.

Berê hebûna Kurdan dihat înkarkirin. Vê gavê "realîteya Kurd" tê pejirandin, încê Kurd bi çekan tîne mehkûkirin. Digel van tiştan îro Kurd bi berxwedan û serhildanên bi rûmet û pîroz rûpelên dirokê bi tîpên zêrîn dinexişînin. Dewletên dagirker jî, bi rûreşîya xwe û hovîtiya xwe di nav dinê de deng didin.

nosîdan tîne mehkûkirin. Dest davêjin qîz û bûkên Kurdan. Di ser de jî dibin pakrewan û xazî (Xwedayo ma êdî ne bes e!)

Berê hebûna Kurdan dihat înkarkirin. Vê gavê "realîteya Kurd" tê pejirandin, încê Kurd bi çekan tîne mehkûkirin.

Digel van tiştan îro Kurd bi berxwedan û serhildanên bi rûmet û pîroz rûpelên dirokê bi tîpên zêrîn dinexişînin. Dewletên dagirker jî, bi rûreşîya xwe û hovîtiya xwe di nav dinê de deng didin.

Dem ev dem e. Kesên Kurd ên ku di vê pêvajoyê de derbas dibin, xwedî helwestek dirokî ne. Û bi siûd in jî. Binêrin zanyarêkî Kurd pêncî sal berê çî mizgîniyê dide me: "Min lez kir, ez di zivistanê de hatim, bihara rengîn li hêviya we ye." Emê bi hev re vê biharê biafirînin.

Em Kurd zehf dilzîz in. Yek bavê me bikuje di pey de qenciyeke biçûk bi me re bike, emê jî tola bavê xwe biborin. Bi gotineke rasttir; Kurd heta vê gavê wisa bûn. Lewma tola Koçgirî, Geliyê Zilan, Dersimê û hwd. hilnedan.

Bi destpêka wergirtina kesaniyeteke nû ya bi rûmet, Kurdan nîrxên xwe jî nû ve nixandînin. Wisa xuya ye ku êdî Kurd jî derziyeke xwe naborin.

tî-demokrat û nêmafdar anîne ser komeleyên F. Kurdistan û malên gelek welatparêzan. Niha li ser tîye sekinînin ku xebata PKK li Almanya qedexe bikin. Kurd bi vê helwesta Almanya ne razî ne. Di germaya rêveçûnê de ev nerazîbûn baş dihatê diyarkirin. Bi giranî slogan wiha dihatine avêtin: "PKK gel e, em PKK ne! Ez jî PKK me! Were min qedexe bike!". Her wiha nivîsên li ser êrişên polisên Almanyayê, li ser komele û malan protesto dikirin.

Kanalên TV yê Almanyayê nîrxên fermî RTL, ZDF,

RTL-FOX, N-TV, WDR... û Ajansa Nûçeyên Almanya (DPA) beşdarî meşê bûn.

Li ser navê F. Kurdistan daxuyaniyek hate weşandin: "Dewleta Tirk li Kurdistanê şerê qirkirina Kurdan bi rê ve dibe. Dewletên Ewropî û di serê de Almanya bêdeng dimînin, ne tenê ev, alîkariya leşkerî jî jê re pêşkêş dikin. Ev li hemberî gelê me heqareteke mezin e, em tu caran ve nemirovahiyê qebûl nakin... Ew êrişên ku hikûmeta Almanya anîne ser komeleyên me, em bi dijarî protesto dikin..."

Bersivek der barê zimên de

Zana Farqînî

Em Kurd hîn qonax û domana xebatên li ser zimên, wêje, huner, dîrok, koka Kurd û peyva wê, nîrx û hêjahiyên Kurdî û hwd. dijîn. Lêgerîn û vekolînên der barê wan mijaran de ji aliyê tîkildaran ve tên kirin û roj bi roj tên ronîkirin. Lê li gel xebatên ronîker, hîn mijarên ku bi gelş in û gengeşî li ser wan tên kirin jî hene. Yek ji wan î nezela jî rêzimana Kurdî ye.

Di vê nivîsê de jî mebesta min jî ew e ku ez li ser nivîsa birêz Baran Rizgar a bi navê "Yê Kurdî, yê Kurdan û yê Kurd" ku di hejmara Welat a Sal: 2, Hejmar: 92, Mêjû 21-27 Mijdar 1993'yan de derketibû, rawestim. Mamoste di wê nivîsa xwe de bi ya min di gel hîn agahiyên ronîker ên li ser zimên, hinên şaş jî dabûn. Ji aliyê din ve hin gazinan jî, ji kesên ku bi zimên re ne tîkildar in û tiştên ne rast lê zêde dikin jî dike. Di vê yekê de em jî pê re ne û heq jî didinê. Lê di rexnekirinê de çewtiyekê jî dike. Ez dixwazim bi mînakên mijarê zelal bikim.

Birêz Rizgar di paragrafa duduyan a nivîsa xwe de wiha dinivîse: "Her diçe em li gotinên wek civata Kurdî, zimane Kurdî, çanda Kurdî û hwd. pirrtir rast tên. Xuya ye van gotinan bi Enstîtuya Kurdî re dest pê kirine û her çûye yên Kurdan bûne yên Kurdî, ango yên bi Kurdan re tîkildar û yên bi zimên re tîkildar tevlihev bûne." Ew nîrxandina jorîn mebest û mijara nivîsê diyar dike ku li gorî mamoste Baran Rizgar di "civata Kurdî" de çewtiyekê rêzimanî heye.

Bi azîneyeke zanistî mijar hildaye destê xwe û bi mînakên li dû şaşiyên dikeve ku di gotina "ala Kurdî" de jî şaşiyekê gramêrî heye. Ji kovara Hawar û Îhsan Nûrî Paşa mînakîyan wek belgeyên pêselmîn (delîl) pêşkêş dike ku cudahi di "ala Kurd/ Kurdî/ Kurdan" de hene.

Bi ya min mamoste "î"ya tewangê ya yekehejmariya nebinavkirî ya zayenda nêrîtiyê û ya navçekirin û pêwendiyê tevî hev kirine. Bi şeweyekî din em bibêjin, "î"ya tewangê û ya ku bi alîkariya daçeka "bi"yê tê

dawiya peyvê ku wateya "ish" a Îngilîzî û "çe" ya Tirkî dide, ji hev dernexistine.

Di zimanê Îngilîzî de bi alîkariya paşgira "ish"ê navê zimane neteweyekê, di Tirkî de bi "çe"yê û di Kurdî de jî bi daçeka "bi"yê ku tê pêşiya peyvê û bi alîkariya "î"ya paşgir, tê çêkirin. Ku em bi mînakên mijarê ronî bikin:

Ez bi Kurdî dizanim Rizgar bi zimanê Erebi dipeyve

Rewşên awarteyî jî hene, mînak:

Baran hînî Tirkî dibe Almanî çawan e?

Ji mamoste re jî diyar e ku tewangbarî taybetiyekê zimane Kurdî ye û li hin deverên welêt tewanga zayendiye ya nêrîtiyê jî navê rabûye. Bi tenê li hemû deverên Kurmancîaxêw rewşa tewangiya mêtîyê xwe hêvişandiyê (mihafîze kiriye). Mînak ji rewşa tewanga mêtîyê re:

Şerê cihanê Keziyê keçikê Pelê darê meha havînê

Tê dîtin ku "ê"ya ji bo zayendiya mêtîyê jî holê ranebû-

ye û gişt peyvên mê bi hêsani ditewînin. Niha jî em bèn ser "î"ya tewangê ya zayenda nêrîtiyê. Ev nemaze li herêma Behdînanê û li hin cihên herêma Botanê wek Cizîrê (ne tev) "î"ya tewangê bi kar tînin. Mînak:

Mala Azadî Çavê şerî Kurtanê hespî Miletê kurdî

Tewanga zayenda nêrîtiyê bi awayekî din ku, ji ya jorîn bêhtir tê bikaranîn jî heye.

Bavê lêwîk Çiyayê Kurmênc Malên bajêr Şoreşa welêt

Di mînakên jorîn de tê dîtin ku "a" an jî "e" di henga rewşa tewangê de ditewin û dibin "ê". Bi vê rewşa xwe peywira "î"ya tewangê bi cih tînin.

Divê bê gotin ku di rêziman de em ne li dû zindîkirina qaydeyên mirî ne. Hin qaydeyên mirî hene pêwîst e ku di rêziman de ji wan behs bê kirin, wek şoreşa di me. Di vê mînakê de "di" di berhemên kevin de hatiye bikaranîn û li Behdînan jî hîn zindî ye. Lê bi

pirranî nayê xebitandin.

Ji aliyê din ve peywira "î"yê ne bi tenê ew tiştên ku me li jor jê behs kirin e. Ji wan çend jê ev in:

1- Têkiliya bi cografayê re Cih, dever, war, welat û hwd. dide nîşan, wek:

Salihê Qubînî, Eloyê Remî, rêxistinên Kurdistanî, welatên Ewrûpî...

2- Têkiliya bi binyata kesan û mensûbiyetê re

Pêwendiya bi kok, bavîk, ezbat, malbat, êl û hwd. nîşan dide wek: Siyabendê Silivî, E-lîyê Xî, Azadê Badikî, leşkerên Almanî

3- Têkiliya bi nav û rengdêran re

Çawanî rengên wan bi me dide zanîn, wek: Bûyereke dirokî, xebatên zanistî, çekên kîmyayî, nêrîneke rexneyî

Beriya dawî li nivîsê bînim, dîsan dixwazim bibêjim ku dema **mirov çanda Kurdî, civaka Tirkî, dewleta Almanî, hikûmeta Îngilîzî, hêzên dijminî** û hwd. binivîse, ji hêla rêzimanîyê ve ne şaş e û nayê wateya tiştê bi zimên ve tîkildar e.

Çend agahî li ser helbestvanî Kurd

Şah pertew, Petro an jî Pertew Begê Hekarî

Silêman Hemdem

Li gor agahdariyên mamotse Sadiq Behaedinê Amedî û Prof. Qanatê Kurdo, der heqê jîna Pertew Begê Hekarî de malûmatên rastî nînin. Dîroka jidayikbûn û jîna wî ne zelal e.

Sadiq Behaedin Amedî, di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê "**Diwana Pertew Begê Hekarî**" de dinivîse ku, Emîn Zekî di pirtûka xwe ya bi navê "**Xulasa Tarih ul Kurd û Kurdistan**" de; Mehmed Eli Ewnî di pirtûka "**Kurd û Kurdistan**" de û mamosta Elaadin Secadî di pirtûka xweya bi navê "**Mejuvî Edebi Kurdî**" de nivîsîne ku; Pertew Begê Hekarî diwana xwe li sala 1221 Hicrê (1806) de nivîsiye.

Ji bo Pertew Begê Hekarî, Şah Pertew an Petro jî tê gotin. Zanyarên Kurd der heqê jiyana wî de tiştêkî qet nenivîsîne. Li gor nivîsandina Qanatê Kurdo, Şah Pertew ji binemalê Mîrên Hekarî ye. Malbata Mîrên Hekarî malbateke camêr, hêja û xêrxwaz bû. Şah Pertew di nav wê malbatê de mezin bûye û hatiye elimandin. Ji ber vê yekê ew li herêma Hekarî pirr navdar e.

Herêma Hekarî cihê rengîn, şîrîn, rind, bi deşt û çiya, gul û havîngêh û zozan bûye. Ew herêm cihê zanistî û kevneşopên klasîkên Kurdî ye. Li herêma Hekarî gelek rewşenbîr, pispor û hozanên Kurd jiyanê.

Di navbera sedsaliya 14-19 an



Pertew Begê Hekarî

de zana û hozanên Kurd mîna **Eli Teremoxî, Eli Herîrî, Feqiyê Teyran, Muratxan, Şeref-xan, Siyapoş, Ebdulsemed Babik** û ên din li wê herêmê jiyanê. Ew zana û hozanên li wê herêmê pirr navdar bûn û kar û barê wan, nivîsên wan li Hekarîyê belav bûbûn. Haya Pertew Begê Hekarî ji nivîsên wan hebûye û ew jî xwe jî binemalê xwendekar bûye. Petro, şagirtê **Melayê Cizîrî** ye. Wî helbestên xwe pirranî li ser rêça mamosteyê xwe nivîsiye.

Helbestên Pertew Begê Hekarî bi naveroka xwe ve cuda cuda ne. Di diwana wî de helbestên evîniyê û yên tasawûfî hene. Di helbestên dildariyê de tema çîniyê (ya dewlemendiye û belengaziye) jî tê şu-

xulandin.

Wî bi pirranî helbestên xwe bêsernav nivîsiye. Helbestên wî dumalîkî, çarmalîkî û pêncmalîkî hatine nivîsandin.

Helbestên Pertew Begê Hekarî, berê di kovara "**Dengê Giti Teze**" de, di hejmara 3, 4, 5 sala 1944'an de hatine weşandin. Paşê du xezelê wî di pirtûka "**Diwana Kurmancî**" de, sê-çar xezelên wî di kovara "**Nûserî Kurd**" de sala 1971'an hatine weşandin.

Diwana Pertew Begê Hekarî, di sala 1977'an de zanyarê Kurd Sadiq Bahadîne Amedî li Bexdayê çap kir. Zeynelabîdîn Zinar di sala 1989'an de ew diwan jî tipên Erebi wergerand tipên Latîni. Wegera Zeynelabîdîn Zinar di 1991'an de jî aliyê Weşanxaneyê Rewşen li Bonnê hat çapkirin.

Diwan du beş in:

1. Bi navê "Diwana Şah Pertew Hekarî, Ebas" e. Ev beş jî sê pişkan pêk hatiye.

a. Beyt: Pirî ev beyta mîna beytên Mevlûda Mele Ehmedê Bateyî hatine nivîsandin. Pirraniya wan dumalîk in. Lê tê de çend çarmalîk jî henin.

b. Pêncmalîkî: Malîkên pêncrêz in.

c. Çarmalîkî: Yanî çarîn in.

2. Ya bi navê "Diwana Pertewî ya Rast" e. Ev beş jî sê pişkan pêk hatiye.

a. Beyt: Pirraniya wan dumalîkî û şeş malîkî ne.

b. Şeşmalîkî tenê yek e. **c.** Hemû 18 malîkên şeşrêz

NAVÊN KURDÎ NAVÊN ME NE..!

Pîştî ola îslamiyê navên Kurdî hatin qedexekirin. Kurdan nikaribûn navên xwe yên taybetî li xwe danîyana, ji ber vî awayî navên Ereban bi kar anîn. Navên Ereban ku bi kar dianîn ev in: Mihemed, Ahmed, Qadir, Resul, Alî, Mihemed Alî, Mihemed Şîrîn û Mihemedê Mihemed bûn, lê mixabin ev navên hanê tu car bi rastî nehatine bilêvkirin. Tim bi awakî çewt û xerab bi kar anîne. Mînak Mihemed (Hemo) Ahmed (Ahmo) Qadir (Qado)...û ji bo ku navên Kurdî jî neyên jibîrkirin, navên xwe li sewalên xwe datanîn.

Navên sewalên terş :Zerê û zero, zerdê û zerdo, keje û kejo, qîrê û qîro, xemê û xemo, şemê û şemo, zeberê û zebero, berfê û berfo, cemedê û cemedo, ladê û lado, zinar, kendal, heval, hogir û delal. Ên sewalên kedî jî: Şiyar, heşyar, teyar, dijwar, heval, zelal, xewar, penê, pengê, dilara, şenê şengê, şewer û şevger û hwd. Navên Kurdan ji siruştê Kurdan hatiye standin, ji ber ku deverek tiştê navê wî bi taybetî heye minak, giwra zeko, zevîya pero, tatê xatunî, kanî tawîya, rezik, çemê kelî, hezaza, girikê legê, şekeftokan, tatokan, mexera kemo, rêzan, rêber, şevger, xewar û xewxweş...Lê, mixabin ev navên han jî terefî dewletê û aligirên dewletê ve wek navên fileh û Ermen tên naskirin. Armanca wan jî ew e ku hin jî, bèn perçekirin û Kurden olperest ji Kurdî û Kurdistanê bidin paş.

Dema gerilayekî/ê Kurd şehîd dikeve, dewlet û aligirin dewletê şehîdan wek fileh û Ermen didin nasîn. Ji ber ku navekî wek Hogir yan jî dilgerm e. Lê kesên ku vî tiştî bîzanebûn dikin, ji bo berjewendiya xwe û hêsaniya xwe ev kesên han jî yên wek Hacı Şefîq û apê wî ne. Em hêvîdarin ku Kurd bi van gotinên ceşîtî nexapin, jixwe kek Amed Tîgrîs ev nav û wateyên wan beyan kiribû. Ji ber vê yekê danasîna wan a Kurdî ne pêwîst e. Jixwe Kurd her roj wan nawan tînin ziman.

S.S. Dilpolo.

Şairê mezin î Kurd Şêx Reza Talebanî

Pismam

Şêx Rezayê Talebanî yek ji şairê mezin î klasîkî yê Kurd e. Di sala 1842'an de li gundê Talebanê, nêzikî Kerkûkê ji diya xwe dibe. Şêx Ebdurehmanê bavê jî serokê şêxên Qadirî bûye. Şêx Reza li bin banekî xanedan û di hembêza malbateke Kurd-perwer û ayînperwer (oldar) de mezin dibe. Ew jî wek hemû xwendevanên dema xwe li hucre û li cem meleyên medreseyan li bajarê Kerkûkê dest bi xwendinê dike, zimanê Erebi, Tirkî, Farisî hîn dibe û helbestan bi wan dinivîsîne. Li gelek dever, gund û bajarên Kurdistanê geriyaye û gelek cihên Tirkîyeyê, Îranê û Iraqê ditiye. Her wiha diçe Stenbolê paytexta Osmanî jî. Ew hemû gerên wî bi taybetî ji bo xwendin û zanînê bûne.

Dibêjin ku Şêx Reza di 25 saliya xwe de dest bi helbestnivîsînê kiriye û bi 4 zimanan (Kurdî, Tirkî, Erebi û Farisî) şîr nivîsîne. Cara yekemîn dîwana wî ya helbestê di 1935'an de li paytexta Iraqê li Bexdayê hatiye çapkirin. Pişt re dîsa li Bexdayê di 1946'an de dîwaneke wî ya din bi Kurdî, Farisî û Erebi tê weşandin.

Her çiqas Şêx ji malbateke dewlemend û serdestên Eşîreta Talebaniya bûye jî, lê ew bi xwe wek aligirê cotkar û hejaran li hemberî derbeg û zordaran derketiye. Û tim "tixî ziban" (xençera ziman) wek tivingekê jêhatî bûye li dijî hemû "tixî debanekan" (xencerên deban) an bi awayekî egîtî û çavnetirsî hilkişandiyê û dawesandiyê wan. Şiirên wî selmînen (delîlên) vê rastiye ne û helwesta wî ya mezin ew e ku li dijî kesên ku xwe ji millet mezintir didin nîşan û bi mal û milkên dinyayê şanaz dibin derkeve.

Şêx Reza di jiyana xwe de tîkiliyeke pîr bi Osman Paşayê Caf û Edîle Xanima xêzana wî re daniye û derbarê vê yekê de gelek gotin û serpehatiyên wî hene.

Di sala 1910'an de Şêx Reza Talebanî koça xwe ya dawî dike û malevayî ji cihana helbesta Kurdî dike. Li "Merqeda Şêx Ebdulqadirê Geylanî" li Bexdayê tê nasîn (veşartin).

Ta niha gelek nivîskarên gewre wek Pîremêrd î nemir, Eladîn Secadî, Dr. Îzedîn, Mistefa Resûl û hwd. li ser vî şairê me yî mezin nivîsîne.

Heke îro em bixwazin di kurtenivîsekê de ji bo xwendevanên rojnameya Welat ên delal danasîna Şêx Reza

Dibêjin ku Şêx Reza di 25 saliya xwe de dest bi helbestnivîsînê kiriye û bi 4 zimanan (Kurdî, Tirkî, Erebi û Farisî) şîr nivîsîne. Cara yekemîn dîwana wî ya helbestê di 1935'an de li paytexta Iraqê li Bexdayê hatiye çapkirin. Pişt re dîsa li Bexdayê di 1946'an de dîwaneke wî ya din bi Kurdî, Farisî û Erebi tê weşandin.


Stûna pêşîn a helbestê li ba Şêx Reza şerecûn (hîciv) e. Nabe ku em wî bidine nasîn û behsa vî cureyî şîrên wî nekin. Di vî warî de Şêx derbareyî her kesî de şîr nivîsiye. Çi kes dibela bibe (nêzik an dûr) heger nerastiyekê û tiştê ne di cih de bike ji wî nafilite.

bikin, em dizanin ku heqê wî em nikarin bidin û ne ew şairekî biçûk e ku mirov bi rûpelekê bi tenê behsa wî bike. Lê belê ku derfet bi destê me bikeve em dê di nîvîske xwe ya din de bi dirêjahî behsa wî bikin û bi awayekî çaktir (çêtir) bi Kurdên bakurê Kurdistanê bidine nasîn. Em pê bawer in ku xizmeteke wêjeyî ye.

ŞÊX REZA Û ŞÎRÊ SERECÛN

Stûna pêşîn a helbestê li ba Şêx Reza şerecûn (hîciv) e. Nabe ku em wî bidine nasîn û behsa vî cureyî şîrên wî nekin. Di vî warî de Şêx derbareyî her kesî de şîr nivîsiye. Çi kes dibela bibe (nêzik an dûr) heger nerastiyekê û tiştê ne di cih de bike ji wî nafilite. Ji bo mînak ku ji ber destê Şêx Elî birayê xwe yî mezin direve û dizane ku sebeb "Hemey Westa Fetah" peyayê Şêx Elî ye û Şêx Elî qayil nabe ku kesek gotineke nebaş bi Hemey Westa Fetah bike. Şêx Reza jî li ser vê yekê bi vî cureyî li hember derdikeve û şerecûnî êrişî wan dike:

"Şêx Elî xo to minit aware kird û derbeder/ Wa çake hecwyekit bikem emma mûfid û muxteser/ Bo Hemey Westafetah êmet hemû aware kird/ Ey Hemey Westa Fetah dayikit



be kerî nêreker". (Şêx Elî te ez ewarê û derbeder kir/ Baş e ku ez hîcvekê bikim kurt û paqij/ Ji bo Hemey Westa Fetah te em hemû eware kirin/ Ey Hemey Westa Fetah, xirê nêreker li diya te be.)

Şêx Hesênê ku xwe mezin dibîne û ji bo kerekî du êlan berî hev dide, belayeke mezin û şerê tund derdikeve, Şêx Reza jî bi vî awayî deng lê dike:

"Bo kerê îlanî herbî kird legelman Şêx Hesên

Seyre xelkîne çî gobendekî gêra em kere". (Ji bo kerê îlana şer kir Şêx Hesên li gel me/ Xelkîno çî ecêb e, vî kerî çî bobelatî anî).

Ev e hostetiya bikaranîna peyvên mecazî di şîrê klasîkî ya me de, bi taybetî li nik Şêx Reza û di helbestê wî yê hîcivî de ku gihiyane lûtkeya xweşbikaranîne.

Şêx Reza Talebanî ev cure şîr li dijî mamê xwe jî bi kar tîne. Dema ku di riya navbera Kerkûk û Koyê de bi karwanî diçe û serî li mala apê xwe dide li Koyê, di nihêre mamê Salih li pêşberî hemû rêz û giramiyê û mêtandariyeke baş ji bo Şêx Reza nan û kere (rûnê nivîşk) datîne. Li ser vê rewşê Şêx Reza ev şîr diavêje serê:

"Gerçî feqîr û deskurte Şêx mame Salihim/ Belam nemdî kesê wekû ew sahi-

biy kerem/ Çûme malekey nan û kerey naye berdemim/ Boye bebê mûdahene memnûnî ew kerem"

(Her çiqas mamê min Salih xizan û destteng e/ Lê min nedît kesek wek wî xwedî kerem/ Çûme mala wî nan û kere danî ber min/ Bêhincet spasî vî kere dikim)

Di heybeyê (tûrikê) Şêx Reza de ji vî cureyî şîr dagirtîne. Şairê mezin Pîremêrd ê nemir li ser helbestên wî ew jî bi cureyê wî, yê mecazî danasîna Şêx Reza ji bo me dike:

Şîrî Şêx Reza taqaneyê Şayistey edebxaneyê (Şiirên Şêx Reza yekane ye/ Layiqî edebxane ye).

ŞÊX REZA Û NETEWÊYÎTÎ

Nayê wê wateyê ku bi tenê di şîrê hîcivî de navdar bûye û dest ji cureyên helbestê yê din kişandiyê. Şêx Reza bi eynî awayî û hostetiye di warê neteweyî û ayînî (dîni) de jî nivîsiye. Di şîrên xwe de behsa bajarê Silêmanî û "Mîrnîşîna Baban" dike ku Kurd bi xwe xwedanê malên xwe bûne û mehkûm û suxrekêşî tu kesî nebûne:

"Le bîrim dê Sûlêmanî kedarulmûlkî Baban bû/ Ne mehkûmî Ecem, ne suxrekêşî Alî Osman bû/ Le ber qapî sera sefiyan debesit şêx û mela û zahid/ Metafî Kabe bo erbabî ha-

cet Girdî Seywan bû"

Di dawiya şîrê xwe de wiha dibêje. "Ke Ebdullah Paşa leşkerî Walî Siney şîr kird/ Reza ew wexta emrî pînc û şeş tîflî debûstan bû.

(Tê bîra min ku Silêmanî mîrnîşîna Baban bû/ Ne mehkûmî Ecem, ne suxrekêşî Osmanîyan bû/ Li ber deriyên serayan şêx, mele û zahîd dibûne rêz/ Wek tewafa Kabeyê kesên muhtac diçûne serê Girê Seywan.

Di dawiya helbestê de jî wî dibêje Şêx Reza: Ku Ebdullah Paşa leşkerê Waliyê Sineyê ji hev belav kir/ Reza wê demê temenê wî pînc-şeş zarokê li ber dibistanê bû.

ŞÊX REZA Û ŞÎRÊN AYÎNÎ

Her wiha derbarê bîr û baweriyên olî û sofîtiyê de jî Şêx Reza nivîsiye û cihê wî xuya ye. Ji bo mînak, şîrekî pîr hêja û bi nav û deng e ku wiha dest pê dike:

"Merbûte heyatim be Sûlêmanî û be xakiy/ Xozgem be segiy qapiyekey Ehmedî Kakiy"

(Jîna min girêdahî bi Silêmanî û axa wê/ Xweziya min bi kûçikê ber deriyê mala Kak Ehmedê Şêx).

DI ŞÎRÊN ŞÊX REZA DE EVÎNÎ

Di vî warî de jî ew bi hosteti derdikeve pêş. Şîrên wî yê evîniyê jî her şakar (mumtaz) in di dîwanên mezin ên Kurdî ya me de, nemir in.

Ew şîra "Ser û ney çîn" ku behsa hebûna atomê dike wek madeyeke belgenexwaz ku çiqas bi hostayî û destrengîni hatiye nivîsin û xermanê şîrê klasîkî ye, me bi berekettir dike. Bi taybetî di malika navîn de.

"Ser û ney Çîn ke le gel gametî to bêne neberd/ Şekerî xwardiwe ney ser û serî day le berd/ Ger delîlî wek û nûqteyî dehenit nebwaye/ Minîş înkariim dekird wek hûkema cewherî ferd/ Lây deparêmewe ey rohî rewanim tû xwa/ Çiye dermanî dilim pêmdelê laço (!) dile derd (!)"

(Serwî û qamiş çî ne ku li ber bejna te bêne şer/ Qamiş derew dike, serwî serê pêl dide li ber/ Ger delîlê niqteya devê te nebûya/ Min înkâr dikir wek pîsporan cewherî ferd/ Ez lavahî dikim û dibêjim ey rihê rewan ê min!/ Tu Xwedê/ Dermanê dilê min çî ye?/ Ji min re dibêje: "Here(!) Biqesite.)

Çend gotin li ser îxaneta dirokî (2)

Di bûyerên birakujiyê de rola PDK'ê

Z. Cûdayî

Wek tê zanîn piştî cunta faşîst a 12'ê Îlonê PKK xwe kişand de warê Lubnanê. Di pey amadekirinên xwe yên ji bo vegerê de, di sala 1982'yan de şervanên xwe şande welêt û di serî de li herêma Botan û başûrê Kurdistanê dest bi çalakîyên xwe kirin. Di wan salan de bi PDK-I'yê re protokolek jî hate îmzekirin. Her çiqas PDK bi plan û kompoyên xwe yên îxanetkar gerîlayên ARGK'ê şehîtkir, PKK'ê li ber xwe da, tehamûl kir û şerê bilind ji xwe re kir armanc. Tu car nexwest bi hêzên Kurdan re têkeve şerî. Li gel vê helwesta PKK'ê, di Cotmeha 1982'yan de **Süleyman Tuğcu** bi bēbextî hate kuştin, di Kanûna 1982'yan de **Şahîn Kilavuz** û 12 hevalên wî di Çemê Hêzil de hatin şehîtkirin. Di sala 1985'an de **İdris Ökmen** û 8 hevalên wî li Dêrişkê û li Heftanînê, di sala 1985'an de **Hemît Avcî** hate şehîtkirin û termê wî jî fermanê Tirkan re hate pêşkeşkirin. Di 1985'an de **Sabrî Sakin** li Deşta Heyatê hate qetilkirin.

PDK LI HEMBERÎ ARGK'Ê

Di hemû bûyerên jorîn de rola PDK'ê heye û di hinan de guman tê kirin ku bi xwe kiribin jî. Ji aliyê din ve gelek şervanên ARGK'ê ji aliyê wan ve di hatine girtin û radestî Tirkîyê kirine.

PDK bi vê yekê jî nesekiniye û bi artêşa Tirk re beşdarî operasyonan bûye, di milê wan de êriş birine ser bargehên PKK'ê û ji wan re rêberîtiyê kirine ku niha jî dikin.

Dema ku Komara Tirk dest avête sazîkirina pergala çetevaniyê (cehşitiyê) jî di sa alikariyê mezin ji PDK-I'yê stand. Li seranserî tixûbê "Bakur û Başûr" bi taybetî di despêkê de li Botanê bingehên cehşitiyê bi PDK'ê avêt. **Tahir Adiyaman, Mecît Pirozbeyoğlu, Süleyman Ahmet, Süleyman Axa** (Mala Teteran) **Mala Bêroxê** û yên wekî wan li seranserî Botanê bûn cehş û PDK piştewaniyê mezin bi wan re kir. Ji sala 1985'an pê ve başûrê Kurdistanê jî bo cehşitiyê bû bingehê xurt.

SEBEBA ŞERÊ BAŞÛR

Ev bûyerên ku qewimîn ji şerê Başûr re, rê vekirin. Di

Dema ku Komara Tirk dest avête sazîkirina pergala çetevaniyê (cehşitiyê) jî di sa alikariyê mezin ji PDK-I'yê stand. Li seranserî tixûbê "Bakur û Başûr" bi taybetî di despêkê de li Botanê bingehên cehşitiyê bi PDK'ê avêt. **Tahir Adiyaman, Mecît Pirozbeyoğlu, Süleyman Ahmet, Süleyman Axa** (Mala Teteran) **Mala Bêroxê** û yên wekî wan li seranserî Botanê bûn cehş û PDK piştewaniyê mezin bi wan re kir. Ji 1985'an pê ve başûrê Kurdistanê jî bo cehşitiyê bû bingehê xurt.



Têkiliyên PDK'ê piştî avakirina Hikûmeta Federal a Kurdî jî bi Tirkîyeyê re bi awayekî eşkere didomin

bihara sala 1991'an de gelê Kurdî Başûr di Şerê Kendavê de fersendeke dirokî xiste destê xwe. Li hemberî rejîma Bexdayê serhildaneke mezin çêkirin. Di nav 10 rojan de hemû hîmê faşîzmê rûxandin û xistin destê xwe. Lê çî heyf, serhildana gel bêsêrokatî bû. PDK û YNK'ê bi alikariya Amerîkayê hikm ji nû ve hildan destên xwe. Ew jî bi trajediyê mezin çêbû. Amerîka di pey de rê da leşkerê Saddam ku bêsêrt û merc teslîm bûbûn. Qirkirin li ser Kurdan pêk anîn. Paşê bi navê "xwedîderketina li Kurdan" û "mafên mirovan" Amerîka, YNK û PDK da pêş, gav bi gav Başûrê Kurdistanê xistin bin hikmê xwe.

DEK Û DOLABÊN DIJMIN

Dek û dolabên dijminan ên li ser gelê Kurd bi destê kom û rêxistinên Kurdan û li hemberî PKK'ê her domiyane û didomin jî. Her dema ku Komara Tirk êriş dibe başûrê welêt ji bo cerdî ser bargehên PKK'ê, partiyên hevalbendê xwe jî dike milê xwe. Di Cotmeha 1992'yan de pêşmergeyên PDK û YNK'ê êrişên xwe yên mezin birin ser bargehên PKK'ê. Komara Tirk jî bi leşkerên xwe ve kete êrişê. Bi hêzên xwe yên hewayî re jî

rojê bi dehan car bi filoya balafirên bargehên ARGK'ê bombe dikirin. 75 hezar leşkerên Tirk li gel 50 hezar pêşmergeyên PDK û YNK'ê ve, çil roj li ser hev cerdî ser PKK'ê kirin. Di êrişê de KT tu encam bi dest nexist. Hêzên wan ên mekanîze li **Zaxo û Kanîmasî** ketin nava şer. PKK'ê di dema ku şer didomiyê de jî li aştiyê digeriya û bi Hikûmeta Federal a Kurd û YNK'ê re ji bo şerrawestîne protokolek îmze kir.

Ev protokola şerrawestîne, armancên Komara Tirk û Amerîkayê pûç derxist. Li gorî

vê protokolê, PKK'ê hêzên xwe yên li ser sînor kişande sehaya Iraqê, li herêma Zêlê bargeheke nû çêkir. Di sa li gorî vê protokolê diviyabû ku PDK û YNK'ê bi têkiliyên xwe bi Tirkîyeyê re bibiriyana. Lê PDK têkiliya xwe her pê re berdewam û xurttir kir.

Ji nû ve xwestin di nav Kurdistanê de Dîwarê Bêrlîne çêkin. Li seranserî tixûb 170 Qereqol ava kirin. Ev qereqol ji aliyê dewleta Tirk ve hatin finansîkirin û xwarin, vexwarin û mehmiyîya pêşmergeyan jî ji hêla wê ve tê temînkirin.

Di sala 1993'yan de şerê

PKK'ê bilind û berfireh bû. Artêşa Tirk li herêma Botan, Amed, Dêrsîm, Serhedê û hwd. operasyonên mezin pêk anî. Lê Tirkîyê di operasyonan de bi ser neket û negihîşt armanca xwe.

HEVALBENDÎ BI ARTÊŞA TIRK RE

PDK di sa li gel artêşa Tirk beşdarî herekatan bû, ji 1'ê Cotmehê dest pê bû ji 15 rojan zêdetir ajot. Di operasyonan de li gel leşkerên Tirk Kurdên cehş û pêşmergeyên PDK'ê jî hatine kuştin, ku di milê leşkerên Tirk de li dijî gerîlayên ARGK'ê û bargehên wê şer dikirin.

Bi van yekan PDK'ê careke dinê rûçîçên xwe da xuyandin ku dev ji îxaneta xwe ya dirokî bernade û her dixwaze di destê Komara Tirk û hêzên împeryalist de wek çekê bimîne.

Li gel rewşa PDK'ê gelê me yî Başûr jî, ji aliyê politikî ve bi pêş ve diçe û romana Kurdistanê serbixwe û azad di bîr û hizran de reh ber dide.

HELWESTA YNK'Ê

Di şerê birakujiyê de helwesta YNK'ê ku xwe dîrî şerê bi vî cureyî dide, girîng e. Di sa gel bi xwe tevî şer nabe. Bi tenê pêşmergeyên ku li qereqolan dimînin û ku meaşên wan ji aliyê dewleta Tirk ve tê dayîn û ku hatine kirêkirin, tevî şer dibin.

Hemû kesên welatparêz, demokrat û pêşverû pêwîst e vê heqîqetê bibîne û hin bêhtir bi awayekî xurt li doza serxwebûn û azadiyê derkevin. Plan û dek û dolabên KT û bēbextiyê, îxanetê pûç bikin. Divê êdî rê ji îxanet û bēbextiyê re neyê vekirin.

WEŞANXANEYA ZAGROS

Li we difikire, niha jî çar berhemên bi Kurdî bi buhayekî şandî pêşkêşî we xwendevanan dike.

✓ Kela Dimdimê:	30.000 LT
✓ Evîna Welat:	70.000 LT
✓ Pêşeriya hewisîna zimanê Kurdî:	30.000 LT
✓ Rêzîmanê Kurdî:	50.000 LT

Her çar pirtûk tevî hev 180.000 Lîrayê Tirk dike.

Lê ji bo we ji buhayê wan % 35 dadixê û bi tenê 117.000 LT li we dike mal.

Navnîşana xwestinê:

Zagros Yayınları

Nuruosmaniye cad. Atay apt.

No: 5/12 Cağaloğlu/ İstanbul Tlf:512 29 17 - 528 61 16

Hevpeyvînek bi Bavê Nazê re li ser romana Kurdi (2):

Pêwîst e nivîskar realîteya jiyane binivîse

Hûn Siya Evîne çawa dibînin

-Li ser vê pirtûka M. Uzun heta niha gelek tişt hatine gotin û gelek kes jî dibêjin ku, ew berhema M. Uzun a herî serkeftî ye.

Mixabin ev berhem jî ne serkeftî ye, binkeftî ye. Hinekî zimanê min kin e, ji ber ku ez jî çîrok û romanên dinivîsinim û yek dikare rabe bibêje: "Bavê Nazê tenê çîrok û romanên xwe qebûl dike û kêfa wî jî nivîsên kesekî re nayê. Pirs ne wiha ye. Hikmê dawî yê xwendevan e.

Ez bi xwe ecêb dibînim ku li Stokholmê civînek li dora maseyeke gilover çêdibe. **Mahmut Lewendî, Firat Cewerî û Xelîl Dihokî** tê de li ser "Siya Evîne" weke berhemeke serkeftî û pîrr heja deng dikin. Û nîşan didin ku "Siya Evîne" yek ji wan berheman e ku M. Uzun dikare xwe pê serbilind bike.

Siya Evîne weke berhemeke wêjeyî, heqê me heye ku hinek pîvanên taybetî em jî nivîskar bixwazin. Çend rengên romanên hene: Siyasî, Civakî, dîrokî û hwd. Û di nava van tevan de ya herî dijwar romana dîrokî ye. Gelekî zehmet e gava ku nivîskar van bûyerên dîrokî yên ku di jiyana hinek kesan de, yan jî di jiyana gelan de çêbûne û ew şexsên ku di tarîxê de hene, dide ber xwe. Weke **Memduh Selim Beg**.

Ev mirov di tarîxê de hebû, bi rastî hebû. Dema ez navê lehengê xwe bikim Serdar, Husên, Ahmet ev jî xeyala nivîskar e û wê çaxê çî bûyerên bixwazim ku wê têximê, ez dikarim. Heqê min e, ji ber ku jî xeyala min e, zarokê min e. Lê belê gava ku şexsekî tarîxî be û tu tiştina bexî ser zimanê wî, yan jî hin bûyerên ne rast pê ve girê bidî, ev ne rast e. Wê çaxê nivîskar berê wî dike derewê, wê çaxê nivîskar ne ku derewan der heqê xwe de, yan jî der heqê hinek şexsan de dike. Ew derewan der heqê dîroka mîletê xwe de dike.

Ez fêr nakim, çawa nivîskar dikare Memduh Selim Beg bibe kerxanê. Çûye, neçûye, çî îsbat li cem wî nivîskari hene? Û çî sebeb hebûn ku wî bîşîne kerxanê?

Xaleke din jî ku gelek balkêş e, nivîskar dibêje ku, M. Selim Beg jî bajarê **Qamişlo** çûye bajarê **Helebê** û Helebî li ser hatina ronakbîrekî jî Qamişlo dipeyivin. Di wê qonaxa tarîxî ku M. Uzun li ser deng dike, jî xwe bajarê Qamişlo tune bû. Ne mimkun e ku mirovek jî bajarekî biçûk were bajarekî mezin û xelk qala wî bikin. Vêca Qamişlo jî tune bû, ew tiştêkî din e. Dema mirovek jî bajarekî tê gundekî xelk dikarin behsa wî bikin.

Dibe ku hinek bibêjin, ev tiştên biçûk in. Gava ez bi van tiştan dizanim û M. Uzun di romana xwe de behsa bûyerên din ên dîrokî dike, li ba min şubhetê çêdike. Ez bi xwe dîroka M. Selim Beg bi firehî nizanim û ev yek jî dibêje sebeb ku nikarim bi firehî li ser rawestim. Romana "Siya Evîne" jî min jî mêj ve xwendiyê. Dema nivîskarek di van pirsên hûr de derewan bike, wê çaxê ew derewên mezin jî dike.

Carekê M. Uzun digot: "Wezîfeya min ew e ku ez binivîsim. Lê ew berhemên tenê an nayên xwedî ew ne problema min e. Hûn li ser vê gotinê çî dibêjin? Mafê nivîskarek heye ku bi vî rengî biaxivê?"

-Carekê min jî bihîst ku, nivîskarek dibêje: "**Wezîfeya min ew e ez binivîsim, ne ku bixwînim**". Ez nikarim fêr bikim çawa nivîskarek dikare bifikire ku, ew tiştên dinivîse wê rojekê hinek nexwînin û li ser deng nekin.

E min bixwe nêrîna min ew e ku yek jî problemên nivîskarên Kurd a herî mezin tengbûna derdora wî ye. Gava tu dibêji: "Min romana te bi Erebi xwend", ez pê diêsim. Gava tu dibêji: "Min ev berhema te xwendiyê ya din nexwendiyê", ez pê diêsim. Ez dinêrim ku tu parçeyekî jî jiyana min dizanî, parçeyê din nizanî. Ez nikarim heta dawiyê bi te re vekirî bim.


Gava xwendevanên nivîskarekî tune bin, ew nivîskarekî çî ye, ez nizanim. Ev pîrseke ku nayê fêmkirinê ye. Tiştêkî seyr e ku nivîskarek van gotinan bibêje. Li ba min, dema mirovek bibêje:

"Min çîroka te xwendiyê", çî pesnê min bide û yan jî rexneyê min bike, ez gelek kêfxweş dibim. Ez dibêjim ku, yekê ez nas kirim, bêtî ku em hev û din bibînin.

We got ku, em romeneke nû dinivîsin. Hûn çî dikarin jî niha ve jî xwendevanan re bibêjin? We teqîma wê çawa plan kiriye? Tu dikarî çend gotinan li ser naveroka wê bibêji?

-Ez niha tiştêkê bibêjim, gelek hevalên ku min nas dikin dikarin di bin simbêlan de bikenin. Heta kengê wê ev roman wilo berdayî bimîne. Di warê vê romana xwe de, min tembelyeke mezin kiriye, min gunehkariyê mezin kiriye. Ji ber ku heta niha min ew lehengên xwe kirine zîndanekê, min derî li ser wan girtiye, min bêhna wan çikandiye. Bi rastî ew lehengên heja ne. Ne ku ez dixwazim pesnê xwe bidim; bi rastî ew lehengên ku di dawiya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de ku, kêm Kurd di wê qonaxê de bi dîroka xwe dizanin. Ew lehengên min dikarin tiştêkî bibêjin û dibêjin jî. Gelek bûyerên dîrokî yên wê demê, **jenosîda Ermeniyana** ya sala 1894'an, bûyerên ku **Alayên Hemidî** kirine, tiştên ku **Con-tirkan** kirine. Ev bûyer tev li ser zimanê lehengên min tînin gotinê. Êşandina wan, bi çî ve mijûl dibin? Çî gunehkariya wan heye? Çî xebata wan hebû ji bo hişyar kirina mîlet? Bingeha şiyarbûnê li ba Kurdan jî ku derê dest pê kir? Jêdera wê jî ku bû? Tiştê jî min hatiye, min xwestiyê ku bi van şexsan bi gewde bikim û hêdî hêdî van tiştan bidim xuyakirin.

Mixabin ev e serê deh salan e ku, min dest bi vê romanê kiriyê. Her demekê ez qonaxekê tê de dimeşim û careke din wan dixim zîndanê û derî li ser wan digirim. Ez li hemberî wan lehengan gunehkar im. Bawer bike lehengên min li ber çavên min in. Forma wan, navên wan, rûniştina wan, danûstandina wan... Pêwîst e ez nêzîk li wan vegirim. Ji ber ku tiştên dîrokî û hemû dokumantên pêwîst min qedandine, tenê tiştên bi xeyala



Bavê Nazê (ne bi awayekî teqez be jî) di sala 1943'yan de tê dinyayê. Di sala 1957'an de mala wan jî Serxetê derbasî Bînxetê dibe. Xwendina seretayî (liseyê) li Sûriyeyê diqedîne. Di 1969'an de jî bo xwendina bilîndiçe Sovyetê. Beşa filolojiya zimanê Rusî li Zanîngeha Lelîngradê dixwîne. Di 1979'an de li Moskovê doktoreya xwe diqedîne. Çîroknivîs û romannivîs Bavê Nazê hem jî wêjeya Rusî berheman wengerandine Kurmancî û hem jî berhemên wî li zimanê Erebi hatine wergerandin.

min ve girêdayî mane. Be kêmahî 6 meh lazim in ku ez li ser rûnim û biqedînim.

Di nav hemû çîrokan, kurteçîrok û romanên te de, kîjan lehengê te bêhtir nezîkî şexsiyeta te ye? Tu dixwazî hevaltiya kîjan lehengê xwe biki?

-Ez naxwazim tiştên ku tene zanî dubare bikim. Jiyanê lehengan carina bi tevahî û carina jî hinek jê, jî jiyana nivîskaran e, leheng pozîtîv be, an jî negatîv be. Bawer bike tim û tim ez şexsiyeta xwe di şexsiyeta "**Xuşnav**" de dibînim. Dibe ku di vir de ez hinekî subjektîv bim. Lê bi rastî kurtê-çîroka "**Navê min Xuşnav e**" bi giştî li ser jiyana min e. Min dixwest vê carê "**Xuşnav**"ê min bikaribûya bi azadî û xweş bersiva xwe bi Kurdî bidaya. Ne bi zimanekî din.

We di nava sohbetê de digot niha çîrokeke min heye, lehengê wê yê bingehîn mirovekî "**Apoçî**" ye. Hûn dikarin hinekî li ser xebatê bidin?

-Çî nivîskar hebe, ger bixwaze ne dîrî mîletê xwe be û realîteya jiyana mîletê xwe binivîse, ew kesên li meydana bin, bixwaze nexwaze divê li ser wan binivîse û têxe nava rûpelên romana xwe.

Li vir pîrs der heqê romana min a ku ez paralel bi romana xwe ya bingehîn re dinivîsim de ye. Min dest bi wê jî kiriyê, li dora 15-16 rûpel nivîsiye û wiha

hiştiye. Gelek tişt der barê wê de li pêşiya min ne zelal bûn. Di wê de jî ez ne parçeyekî Kurdistanê, lê Kurdistanê bi tevayî didim ber xwe, li gorî derfetan. Madem ku bakurê Kurdistanê dikeve meydana, ez bixwazim nexwazim wê xebata PKK'ê çî pozîtîv û çî negatîv bi min re derbas bibe. Ger ew xebat bibe berhemeke wêjeyî, divê di jiyana hinek kesan de bi gewde bibe. Ew kes bixwazim nexwazim divê "**Apoçî**" bin. Ne endamên partiyeke din bin. Her wiha wê endamên partiyên din jî hebin, wê danûstandin di nava wan de çêbibe. Lewma jî divê nivîskar nêzîkî hêzên siyasî yên gelê xwe be, têkiliyên wan, etîka rabûn û rûniştina wan, fedekarî û rastiya wan fêr bike. Ez gelekî dixwazim têkevim nava civatên wan, rewşa wan a hundir û derve baş nas bikim.

Di sa bêtî ku ez bifikirim lehengê min jî bakurê Kurdistanê ye. Berê biçûk bû, niha mezin bûye û dest bi şoreşgeriyê kiriyê. Di vî warî de min fêde ji wan hevalên ku di nava xebatê de mane girtiye. Çawa sinor derbas dikirin. Beriya ku PKK dest bi serê çekdarî bike rewş çawa bû? Zorî çî bûn? Û di nava şer de jiyana çawa ye?

Hevpeyvîn: R. Cizre

S. Azad

Pirtûka Gabar Çiyan-Bekir Yıldız, bi navê Şorbe li Swêdê derket. Di pêşgotinê de Gabar Çiyan dide zanîn ku ev pirtûkî gelek çîroka pêk hatiye.

Wek: Mihemedo Ronî, Şorbe, Mele û Şeytên û Çîçek û Şehîd. Ev çîrok, bi awayekî şanogerî hatine amadekirin. Nivîskar, di pêşgotinê de dibêje: "Heya ji me hat, me xwest ku şano, ji awira naverok û datalyên kirinê ve (mîmîk û hwd.) xurt bin..." Her wiha dom dike "...Weke hemû caran, em di sa li benda rexne û pêşniyarên we ne. Em bi we û bi dîtinên we xurttir in."

Bi vê yekê riya rexna jî vekirî hiştiye. Wek tê zanîn ku wêjeya (edebiyata) Kurdan, di hêla warê nivîskî de pîrr qels e. Bingeha wêjeya Kurdan li ser hîmê wêjeya devkî hatiye avakirin. Şanoya Kurdan jî, wek cureyên pexşan ên dinê, qels e. Di vî warî de berhemên ku hatine afirandin, jî bilî form û naveroka xwe bi pîrranî li ser me-

Pirtûkeke şanoyê: Şorbe

sajên neteweyî (bi tarzê sloganî) tîr afirandin. Pirtûka Gabar Çiyan-Bekir Yıldız jî, jî wêjeya Kurdan a devkî bûye û bi celebê Şanogerî hatiye amadekirin. Lê bi rastî, mirov dikare bibêje adabtasyonê ne serkeftîye. Ji ber ku di vegotina devkî de bûyer, bi zêlabûn û herikandina zimên, di nav salan de hatiye parzînan. Icar ev pirtûk, hem jî hêla naveroka xwe pîrr qels e û hem jî weke adabtasyonê sîniî tîr xuyakirin. Gabar Çiyan, di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê 'Eşa Zirav' de

GABAR ÇIYAN-BEKİR YILDIZ

ŞORBE

Gab. Azad

dibêje: "Şano, karêkî hunerî ye. Pêwîst e berhem bi hunerê bê neqîşandin. Yanî berhemên li ser sloganan ava bûne nikare bibe şanoyî."

Di karê hunerî de adabtasyon jî girîng e, lê hewce ye ku berhema tê wergirtin, ji ya ku jê hatiye girtin, ne kêmîr be. Li gor ku tê dîtin, ev şano jî çîrokan ku di nav xelkê de bi awayekî devkî tîr gotin, hatiye wergirtin. Di wêjeyê de jî vî karî re tê gotin adabtasyon. Wek tê zanîn, di despêka wêjeya Tirkana Heyama Tanzîmatê de jî,

adabtasyon hatin çêkirin. Lê bi rastî, ew berhem di tarîxa wêjeyê de man û ji hêla nîfşên nû ve nayên zanîn.

Ji pirtûkê çend kêmasiyên xuya, wek mînak di warê zimên de: Di rûpel 5'an de, "Mihemedo ronî, min çî got û tû (tu)... Ger xort be, tû (tu) car û tû (tu)..." û di rûpel 7'an de "Gava tû (tu) yek bê (be) û ew yek bê (be)..." û hwd. Kêmasiyên zimên zehf in. Nivîskar, dibe ku bibêje ev taybetî yên herêmî ne. Lê di şanoya Kurdan de pêwîst e ku ziman ne herêmî be, ji bo ku zimanê giştî bê avakirin. Peyva dawîn: "Li Kurdistanê şanogerî roj bi roj pêş dikeve. Ev tişt mirov kêfxweş dike. Hunermendên nû derdikevin. Divê ku mirov riya wan veke ..., û ...Şixulkêrên hin kovar û hwd. hiene ku ne rexnegir in.....Lê heya ku bi ser nîgan bikevin. Em bi destên wan bigrin, heya bi firê kevin... (ji pêşgotina 'Eşa Zirav', Gabar Çiyan, rûpel 1 û 3)"

Ev rastî, jî bo me gişan pêwîst e.

Di 27'ê Mijdarê de:

Gelê Kurd bi rastiya xwe hesiya

Lehengên Kurd di zindanan de, jiyan didan wê tovê vejînê. Destpêka berxwedanên di Zindana Amedê de, bû destpêka bihêvîbûna gelê Kurd jî û her çû geş bû û tûre da (bişkiwî). Lehengên mezin Mazlûm, Ferhat, Necmî, Mahmût, Eşref, Kemal, Hayrî, Alî û Akîf buhayê vê geşbûnê bi xwîna xwe ya pîroz û bi canê xwe yê ezîz dan û bingeha damezirîna 27'ê Mijdarê qewî kirin.

S.Özcan

Dûrketina gelê Kurd a ji rasti, tore, ziman û ezîtiya xwe ber bi pêvajoyeke tarî ve diçû. Bêhêvîti, bêrêxistinî û dûrketina ji netewebûna xwe civakê dagirtibû. Gelê Kurd gav bi gav ber bi tunebûnê ve diçû. Dema gotina bes hatibû û derbas dibû, lê hêzeke ku bikaribe bibêje bes, li holê ne xuya bû. Piştê têkçûna Serhildana Dêrsimê ya di 1938'an de, li Kurdistanê Bakur xwedîderketina li Kurdayetî û welatê xwe di raman û nêrinên gelek ke-

san de ji xeyaleke şîrîn pê ve tiştêkî din nîn bû. Tevî hinek tevger û xebat hebûn jî, ev têrî têkoşîneke li hember dagirkeran nedikir. Têrî sefirakirina li hember bêdengiya reş a piştî 1938'an nedikir. Nedibû hêvî ji gelê Kurd ê di xewa bindestiyê de.

Lê tevî hemû van neyîniyan, têkoşînek xwe dida der û tovê jiyanê diçand li ser axa welêt. Ji bo şînbûna vê tovê jiyanê, xwîn jî hatibû rêtin. Xwîna heval Hakî Karer. Lê hê jî gelek tişt nediyar û şîlo bûn û rê li ber vejîneke dirokî digirtin. Bi ser vê rewşa ne zelal û bi mêt ve, derbeya faşîst a 12'ê Îlonê jî hat û wek ewreke reş û tarî bi ser gelê Kurd û Tirk ve girt.

Lehengên Kurd di zindanan de, jiyan didan wê tovê vejînê. Destpêka berxwedanên di Zindana Amedê de, bû destpêka bihêvîbûna gelê Kurd jî û her çû geş bû û tûre da (bişkiwî). Lehengên mezin Mazlûm, Ferhat, Necmî Mahmût, Eşref, Kemal, Hayrî, Alî û Akîf buhayê vê geşbûnê bi xwîna xwe ya pîroz û bi canê xwe yê ezîz dan û bingeha damezirîna 27'ê Mijdarê qewî kirin.

Berxwedana Mezlûm û hevalên wî, germa xwe da çiyayê Botan, li wê ji xwe re jiyan dît, kemilî û di demeke kin de berhemên xwe jî da, bandora vê vejînê li hemû Kurdistanê belav bû.

Dirokê careke din jî da xu-


yan ku egîd û mêrxasên Kurdistanê xelas nabin. Ew gelê ku Kawayê Hesinker, Seyîd Riza, Şêx Seîd, Qazî Mihemed û gelek rêberên mezin ji nava xwe derxist, dikaribû gelek rêber û lehengên mezintir jî derxe û têkoşîna xwe ya dirokî ya li hember dagirkeriyê her û her bidomîne.

15 saliya damezirîna Partiya Karkerên Kurdistanê bi van rastiyan girîngiya xwe hin bêhtir dide zanîn û xwedîderketina li vê têkoşînê dike peywira her Kurdekî ku li ser vê axê diji. Di van 15 salan de gelek cangorî, jiyana xwe ji bo welatê xwe dan,

gelek xwîn hate rêtin, dilê gelek dayîkan şewitî. Lê ketina her bedenekî, rişîna xwîna her lehengekî û her dilopekî ji çavên dayîkên Kurd a ku ket ser axa welat, giyan da tovê serhildanê, bû hêvî, bû bawerî û xemgîrî tevî diroka reş kir. Cihê xwe ji destpêkeke nû re û ji hêvî û sahiyê re hişt.

Têkoşîna li Bakur, bandora xwe da her çar parçeyên Kurdistanê û gelê Kurd ê li dinyayê belavbûyî. Têkiliyên Kurd û Kurdan qewî kir, nêrin û baweriyeye hevpar da, hêviya Kurdistanêke azad û serbixwe belav kir, dawî li bêhêvîbûn û xewa bin-

destiyê anî. Gelê Kurd bi rastiya xwe hesiya. Xwedî li nirx û berjewendiyên xwe yên neteweyî û civakî derket. Gelê Kurd, dost, dijmin; rastî, şaşîti; qencî û xerabiyê ji hev nas kir. Girîngiya birêxistinîyê fêhm kir, hêza xwe kir yek. Nasnameya xwe nas kir û xwedî lê derket. Ji bo rizgarî, azadî û serxwebûna xwe gav bi gav bi pêş ket û ev pêvajoyê bi awayekî serkeftinî didome. Gelê Kurd di diroka xwe de tu caran bi vî rengî bi can û dil têkoşînekê nedomandibû, lewre jî relibergirtina wê negengaz (mumkun) e, ta serfiraziyê.



XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Serokê Komeleya Kurdên Sovyeta Berê û endamê Meclîsa Nete-weyî ye. Di wêne de tê dîtîn 2-Dilî/ Curreyek bagera berfê 3-Qût/ Embarên li dorhêla Lîmanan/ Navê darekê 4-Esman/ Banga hewarê ya navneteweyî 5-Jin/ Ders 6-Sembola Nîkelê/ Li gor baweriyay olî, navê melayketê ku li dijî Xwedê rabûye 7-Wênesazê ku li şopa DADA diçin 8-Axa, xwedî mal û milk/ Tav 9-Navê bajarvaniyeke kevin li Mezopotamyayê/ Navê hacetekî cotkirinê 10-Qewet/ Pirça li rûyê mirov

Serejêr: 1-Di çanda Kurdî ya kevin de navê Xwedê/ Pişk 2-Dewletên Amerîka yên Yekbûyî (kinnivîsina wê ya bi İngilîzî)/ Navê Serokê Kubayê 3-Amûrekayê ku bi pirranî li balefîrgehên ji bo şopandina balefîran tê bikaranîn/ Hay 4-Ard/ Navekî mêran/ Mak 5-Nediyar, yê ku nayê dîtîn, lê tê zanîn 6-Navê curreyek çekên nukleer/ Navê bajarekî Fransayê 7-Dengbêjekî Kurd ê bi nav û deng/ Sembola Îrîdîûmê 8-Qertafa lêkara "bûn"ê ya yekhejmariya yekemîn/ Navekî din ê Asûriyan 9-Oxir 10-Cihê ku gundî lê berhemên xwe diîroşin 11-Çiçek dikevîne navê 12-Jê şorbe çêdibe

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Necdet Adali 2-Awarte/ Ava 3-Şan/ Aghî/ Me 4-TNT/ Eza/ Kêf 5-Marat/ Ewr 6-Nemane 7-Teşî 8-Variq/ Çi 9-ÎRA/ Awaz 10-Nîşe/ Avî

Serejêr: 1-Naştin/ Vîn 2-Ewan/ Etarî 3-Cant/ Meraş 4-Dr/ Maşî 5-ETA/ Anika 6-Tegere/ Wa 7-Aza/ Çav 8-Dahat/ Rizî 9-Avî 10-La/ Ke 11-Mêw 12-Befr

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkîyê: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopîyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay

Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	120.000	50 DM
6 meh	240.000	100 DM
12 meh	480.000	200 DM

Hêvî ne zarokên Kurdan

Jîr Dilovan

Lihevhatî û xweşik in
Zêrîn in zarokên Kurdan
Devliken in çavreşik in
Şîrîn in zarokên Kurdan

Nêrîntûj in, weke şêr in
Naştexilin zoq dinêrin
derd xemên xwe

vedişêrin

Birçîn e zarokên Kurdan

Nasekinin dixebitin
Di germê de diqemitin
Li ber tavê dişewitin
Tim tînin zarokên Kurdan

Bi xebat û bi lebat in
Zarokiya xwe nas nakin
Ew cilên nû li xwe nakin
Tazîne zarokên Kurdan

Jar û xîz in, tim bi şîr in
Dê û bavê xwe nabînin
Sêwî û hêsîr dimînin
Najînin zarokên Kurdan

Çavbelek in, porzêrîn in
Devbiçûk in, xwînsîrîn in
Weke kulîlkên rengîn in
Bi bêhn in zarokên

Kurdan



Bêwelat in û bêxak in
Zilma dijmin ji bîr nakin
Ji neyarên xwe hez nakin
Bi kîn in zarokên Kurdan

Her yekî wek çêlkên şêran
Xwe davêjin bin panzêran
Şer dikin ew piştî mêran
Hêvî e zarokên Kurdan

Mizawir in, gelek jîr in
Dilpaqij in, weke şîr in
ji me re bawer û bîr in
Evîn in zarokên Kurdan

Tim alên sor li ba dikin
Herdu tiliyên xwe şûr in
Ji me re bawer û bîr in
Evîn in zarokên

Kurdan

Derdikevin serê kuçan
Radihêjin kevir û qûçan
Dibin tirsê hov û hirçan
Şervan in zarokên Kurdan

Kevkanîkên wan dirêjin
Kevirên xwe dîr davêjin
Gava dikin deng û pejin
Li kar in zarokên Kurdan

Şareza û çavvekirî
Dibin kelem, dibin dirrî
Wan bi xwe re l'dijmin birrî
Bager in zarokên Kurdan

Ji welatê xwe bi der in
Bajar bi bajar digerin
Li gundê xwe venagerin
Stûxwar in zarokên

Kurdan

Bêxwarin û bêberoş in
Avgerîn in, nanfiroş in
Wek ji nêrî şîr bidoşin
Bêkar in zarokên Kurdan

Notirvanê rez-bîstanan
Tu car naçin dibistanan
Ne havîn ne zivistanan
Naxwînin zarokên Kurdan

Dora wan tim mêş û moz
in

Destbiqirê, j nigbitoz in
Li ser piştê kerê boz in
Siwar in zarokên Kurdan

Tomofîla wan têla xelek
Digerînin çerx û felek
Tim didin dûv gayê belek
Gavan in zarokên Kurdan

Dest bi lepik, gore hirî
Çarox li pî, kum li serî
Ew in xwediyê gîska gurî
Şivan in zarokên Kurdan

Hem û keç û kurên me ne
Dest û ling û serê me ne
Şibê jin û mêrê me ne
Bo me war in zarokên

Kurdan



Siya çekên nukleer li ser jiyanê

M. Zahir Kayan

Bi çêbûna dewletê re komên mirovan derbasî jiyanê civakî bûne, di navbera wan de rêxistin der daye. Lê dewlet li gorî Marks quweteke bi kotek e. Qedexeyî, astengiyên li ser jiyanê kes û ramanan, bi hatina vê rêxistinê ve girêdahî ye. Pêwist e ku bandora dewletê ya li ser kes, raman û jiyanê civakî rabe. Ev rewş ne tunebûna dewletê ye, her wekî şikandina serdestiya dewletê, riya ci-vakeke serfiraz vedike. Di dîrokê de ew dewletên hatine damezirandin her car pêdiviyê wan bi çekan hebûne. Mînak: Şûr, tîr, mencenîq, top û tîfing û hwd. Ev giş delaletê li ser pêdiviyên dewletê û rêxistinên siyasî dikin. Rast e. Carinan hebûna çekan civakan li hemberî dewletên êrîşkar dide parastin. Lê belê bi xurtbûyîna teknolojiyê ve hinek çekên kimyewî û nukleer hatine afirandin. Ev çek jiyanê mirovahiye û hebûna xwezayê tehdît dikin. Rewşa Yekîtiya Sovyeta berê û niha û DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) vê pirsgrîkê derdixin holê.

Kovara "Bilim-Scientific American" maqaleyêke bi navê "Çekên bi serîk ên nukleer de çawa bêne teribandin" weşand. Maqale ji aliyê van nivîskarên Frank Von Hippel, Marvin Miller, Harold Feiveson, Anatoli Diakov û Frans Berkhoût hatiye amadekirin. Maqale li ser du pirsgrîkan sekiniye: 1-Ji holêrakirina fuzeyên bi serîk ên nukleer bi tomerî. 2-Xebitandina serîkên nukleer di reaktörên atomî û yê enerjiyê de. An ne-xebitandina serîkên nukleer û parastina van serîkan di camên fosfat û borosilikatê de.

REWŞA FUZEYÊN BI SERIK

Ji bo vê armancê ji sala 1991'an ta niha gelek xebat hatine kirin û li gorî kowara "Bilim-Scientific American" wê bi hezaran serîkên nukleer ji aliyê gelek dewletan ve hatine hildan. Peymana ku bi navê Start-I, Start-II di navbera Soyeta û Amerîkayê de hate peji-randin, der barê rakirina van fuzeyên bi serîk ên nukleer de gelek mercan tîne. Ji van merca-yan yek ji çêbûna heyetan e û kontrolkirina ji holêrakirina van fuzeyên bi serîk ên nukleer in, li Soyeta û li Amerîkayê. Ta niha ev peyman çiqas gihîştîye arma-ncax we ne eyan e. Kowara Bilimê bi çavê sar li aliyên Soyeta û siyaseta wê ya niha dinîhêre. Dibêje ku bandora Amerîkayê ewqas li ser jîholêra- kirina fuzeyên nukleer ên ku li Soyeta ne tune. Ji aliyê din ve jî dibêje ku Li Soyeta rewşa ku niha dide xuyan der barê çekên nukleer de ne qenc e. Lewre di- be ku ev serîkên bi nukleer

têkevîne destê hinek dewletên şerxwaz û hinek komên terorîs- tan. (Ew komên ku dewletê ser- mayedar in wek Amerîka û hwd ji wan re dibêjin terorîst, ne peyvekî zanisti ye, her wekî vê peyivê di wateya siyasî de bi- kar tînin. Ev komên han li hember rêxistin û rejimên wan têdikoşin, ji ber vê yekê ye ku ji wan re terorîst dibêjin) Di sala 1991'an de rejima Sovyeta Berê xera bû û ji vê xerabûnê gelek komarên mezî û piçûk derketine holê (Rûsya, Ukrayna, Kazakistan, Rûsyaya Spî û hwd). Ev komarên hanê ji Rûs- yayê mafên xwe dixwazin, car caran di navbera wan de şer jî çêdibin. Çekên nukleer bi giştî li ser erdê van komaran hatine avakirin. Ev çekên nukleer ku têkevîne destê van komarên bi- çûk ên ku ji Rusyayê qetiyane, dibe ku li hember hevdu van çekan bixebitînin. Endîşeya mezî ev e. Lê ev sîf dîtîneke A- merîkayê ye, çiqas rast e em ni- zanin. Bi kurtasî ta niha li ser ji holêrakirina fuzeyên nukleer peymanek hebe jî, li ser ji holêrakirina talûkeya hebûna fuzeyên bi serîk ên nukleer tu havilê mirovan têr nake.

PEYMANA START-I, STAR- T-II ÇI TÎNE ?

Ev çekên bi serîk ên ku di destê Sovyet û Amerîkayê de ne, bi peymanên Start-I û Star- t-II' ve di demeke kin de, lazîm e bêne bêtîrîkirin. Li gorî mer- cên peymanê Start-I'ê ew çekên nukleer ên ku li cem Sovyeta kevin û Amerîkayê he- ne, ta sala 2003'yan pêwîst e ku ji 10 hezarî dakeve 3500' î. Dîsa wek xwestina vê peymanê fuzeyên nukleer ên ku li ser erdê Ukrayna, Kazakistan û Rûsyaya Spî ne, werin rakirin û li Rûsyayê têkevîne bin bandora noproliferasyonê (li dijî derketi- na hilpişikîna çekên nukleer). Ev her sê komar (Ukrayna, Ka- zakistan, Rûsyaya Spî) li gorî xwe peymanên Start-I û Star- t-II'yê nixirandine. Rûsyaya Spî mercên herdu peymanan, Ka- zakistanê mercên peymanê Start-I'ê peji-randiye. Ukray- nayê herdu peyman jî qebûl ne- kiriye. Wîsa dixuyê ku rakirina van çekên nukleer li Rûsyayê ne tiştekî hêsan e.

METODA JI HOLÊRAKIRINA FUZEYAN

Îro li ser dinyaya me sîf li ser erdê Rûsyayê 35 hezar fuzeyên nukleer ên bi serîk hene. Ên li ser erdê Amerîkayê û li de- verên din ku bêne hesabandin de hejmara fuzeyan derkeve re- hejmareke mezî. Ev çekên nukleer demekê ji bo serdeski- tiyê û ji bo cedelê li ser ruyê dinyayê hatine veşartin; lê ew dewlet zû heşyar bûn. Pê der- xistin ku ji faydeya wan zêdetir,

ziyana wan heye. Mirov nikare van çekan bixebitîne, dema ku hate xebitandinê, jiyanê biyolo- jîkî serobinî hev dibe. Li hem- ber jiyanê tehdîteke mezî e. Bilî van tespîtan ev çek ji bo butçeyê jî barekî giran e. Îro em dikarin bibêjin ku Ūris û A- merîka di navbera xwe de der heqê jîholêrakirina çekên nuk- leer de peyman çêkirine û dix- wazin van çekên nukleer ji holê rakin. Çiqas dubendî di navbera wan de hebin jî, lê herd serî jî dixwazin ji van fuzeyan bifelitin. Mixabin jê xelasbûna van çekan wîsa ne tiştekî hêsan e. Çêkiri- na van fuzeyan, ji holêrakirina wan dijwartir e. Lê dîsa jî du havil hene:

1-Ew plutonyûma ku di hundirê çekên bi serîk ên nuk- leer de hene lazîm e têkevîne çarçoveyên camê. Ev cam li Sovyeta berê bi fosfatê, li Ja- ponyayê, li Ewrûpa û Amerî- kayê bi borosilikatê hatine çêki- rin. Camên ku bi borosilikatê hatine çêkirin, ji bo parastina plutonyûm û ūranyûmê bi eh- miyet in. Plutonyûm di van camên borosilikat û fosfat de di binê erdê de tê veşartin, bi vî tewrî demeke dirêj zirar û ziya- na vê elementê tê kuştinê.

2- Ew plutonyûma ku di hundirê serîkên fuzeyan de he- ye, lazîm e were parzîndanin. Ango tesîra radyasyona pluton- yûmê bê şikandin. Ji bo vî karî pêşwîst e ku plutonyûm di re- aktörên de bi bombebarana tirêjên kimyewî ve bê parzûnki- rin. Dema plutonyûm ku di re- aktörê de bê xebitandin, dem dibore plutonyûm ji radyasyona xwe berî dibe û dikeve radeye- ke bêzîrar. Lê ev herd havil jî projeyên dijwar in û gelek pirs- girikan derdixine pêşya mirov.

ÇEKÊN BI SERIK ÇI NE?

Dema em li şemaya çekên bi serîk mîze dikin, du beşan dibî- nin. Di beşa yekemîn de plu- tonyûm di hundirê teqîneke kimyewî de ye. Ev plutonyûm jî aliyên ūranyûmê ve hatiye dew- lemendkirin. Plutonyûm di vir de wek sê çar kilo ye. Di beşa duwemîn de şivika lityûm deteryûm heye û li der û dorê şivî- ka Lityûm deteryûmê ūranyû- ma ku ji aliyê radyasyona xwe ve dewlemend e hatiye pêçan- din. Di beşa duwemîn de 15 ki- lo HEU (Higley, Enriched Ūra- niyûm -Ūranyûma ku ji aliyên radyasyonê ve hatibe dew- lemendkirin- di beşa yekemîn de jî du sê kilo plutonyûm ama- de ye. Dema ku fuzeyên bi se- rik jî hev tene derxistinê, herî pêşîn ew serîkên ku HEU û plutonyûmê di xwe de dihewî- nin tene veqetandin û di hinek cihên parêzgeh de tene veşar- tin. Dema ku plutonyûm di re- aktörên de tê xebitandin, di de- mekê şûn de HEU'ya pluton- yûmê kêmbê dibe û plutonyûm di-



Çekêk bi serîkên nukleerî jî Ūkranyayê jî bo ku li Rûsyayê bê depokirin li erebeyê tê barkirin.

keve awayekî normal û zirar wê tê şikandin. Li Sovyeta berê 150 ton plutonyûm 500 ton HEU, li Amerîkayê jî 50 ton plutonyûm 400 ton HEU heye. Ev element li Amerîkayê di dez- gehên Wezareta Enerjiyê de yê li pentxê li herêma Amarîl- lo/ Texasê, li Sovyeta berê jî li Wezareta Enerjiya Atomê ya li Tomsk a Sibiryayê tene derxistin. Ji bo veşartina van elemen- tan (HEU û plutonyûm) li amerî- ka û li Ūrisê gelek veşartgeh hatine amadekirin; lê ev veşar- tgeh jî bo demeke kin bersiv di- din, ji bo demeke dirêj qels di- minin. Ku rojên di pêşya me de dinya jî bo veşartina van se- rîkan, an jî texrîbkirina wan ha- vilekê nebîne dê pirsgrîkên mezî wê derkevin holê.

Ev HEU ya ku di çekan de tê xebitandin, lazîm e tevî hinek celebên ūranyûmê be. Mînak: Ūranyûma xwezayî ya % 99.3 ku îzotopên 238 di xwe de dihewîne ku tevî HEU'yê bibe, wê demê HEU li serhev nakeve reaksiyonê û di çekan de nayê xebitandin. Îro Amerîka dixwaze 500 ton HEU'ya Soyeta bi 10 mîlyar dolarî bi- kire. Lewre Amerîka pey ener- jiya ku ji HEU'yê derdikeve ke- riye. Ji aliyê din ve ew pluton- yûma ku ji fuzeyan tê derxistin, lazîm e bi hinek fizyonên ma- deyên radyoaktîf ve bê li hev- xistin, ango ev madeyên radyo- aktîf tevî plutonyûmê bibin. Ji bo vî jî tek havil ew reaktörên ku bi avê (reaktörên sivik ên avî) û bi enerjiya karma oksîta

ūranyûma 235 tene xebitandin, di wan reaktoran de di dewsa ūranyûma 235'ê pêwîst e plu- tonyûm bigire. Plutonyûma ku dikeve dendika reaktörê di nav- bera çend salan de % 40 ji ra- dyasyona xwe wînda dike. Wê demê ev plutonyûma ku di re- aktörê de hatiye parzûnkirin bi giştî di çekan de nayê xebitan- din. Lê dikare bibe bombeyên normal.

Her dewlet niha li ser ji holêrakirina van fuzeyan na, lê li ser veşartina fuzeyan û ji bo enerjiya ku ji plutonyûm û HEU'yê bê derxistin dixebitin.

Bi kurtasî pirsgrîka ji holêrakirina fuzeyan bi serî xwe tenê tiştekî îfade nake, lewre jîholêrakirina van fuzeyan ne karekî hêsan e. Ji ber qels- bûna teknolojiyê û sedema jê îstîfadekirina enerjiya van ele- mentan, texrîbkirina van seri- kan dikeve astengiyê. Rewş wî- sa dide xuyakirinê ku texrîbkiri- na van çekên bi serîk ên nukle- er dê demeke dirêj wîha bêhavlî bimînin. Kovara Bilim -Scien- tific Americanê beyan kir, "Soyet bi vî çûyîna teknoloji- ya xwe ta 40 salî jî paqîjkirin û parzûnkirina HEU'yê xelas na- be." Du rê li pêşya gelê dinyayê heye:

1- Yan wê plutonyûm û HEU'ya çekên bi serîk tîxine çarçoveyên camê û di binê erdê de biparêzin.

2- Yan jî wê plutonyûm û HEU'yê di reaktoran de bixebi- tînin û tesîra wan a radyasyonê bidin şikandin.

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saet 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.